

ARMANC
mehê
carekê
dertikeve
Hejmar: 123
Çileyê Pêşîn
1991
Buha: 15 Skr.
3 DM

Armanç

ARMANC
Monthly
Kurdish
Magazine
No: 123
December
1991
Price: 15 Skr.
3 DM

SERXWEBÛN DEMOKRASÎ SOSYALÎZM

Meclîsa Tirkîyê di civîna xwe ya taybetî ya li ser pirsê Kurdî de li ser pêşlêgirtina doza Kurd munaqêşe kir

Ji bilî qereperê ji Kurdan re dîsa tiştêk tuneye



Mahmut Alınak: "Dema rê li ber li mafgeriyên bê girtin, wê gavê jî mirovê li riyên edaletê bi destê xwe bi cî bike, bigere"

□ Serok û berdevkên partiyên Tirkîyê di civîna meclîsê ya vekirî ya li ser pirsê Kurdî de ne li ser maf û huquqê Kurdan, lê li ser şertên pêşlêgirtina têkoşîna Kurdan rawestiyên. Nehîştin parlementerê Şîrnexê Mahmûd Alınak axaftîna xwe biqedîne ew ji kursiya meclîsê bi zorê anîn xwarê.

Roja 27'ê Çileyê Pêşîn meclîsa Tirkîyê bi navê "ewlekariya hundurîn" bi civîneke taybetî pirsê Kurdî munaqêşe kir. Civîn di eynî wextê de di televîzyona Tirkîyê de jî hat nîşandan.

Roja ku hukûmeta Demîrel hat ser hukum, li ser pirsê Kurdî ne berbiçav be jî, qala avêtina hin gavên demokratîkên dikir. Di dema ziyareta xwe ya Kurdistanê de Demîrel digot "Em îdentîta

Kurdan" nas dikin û emê gavên pêwîst bavêjin. Ev bû sedem ku hin kes jî komcivîna meclîsê hin hêviyan bikin.

Lê dema komcivîna dest pê kir û serokên partiyên, berdevkên wan yek li dût yekî rabûn axaftinên xwe kirin, diyar bû ku meclîs, hin meclîsa kevin e, serî seriyê kevin e. Axaftinên serokên hukûmeta nuh jî demagojî û ji xapandinê pêştir ne tiştêkî din e.

Axaftinên serokên hemû partiyên li ser wê bû ku ewê çawa karibin tevgera Kurdî bifetîsin, çavkaniyên wê çî ne û çawa tê

Dûmahik: r. 11

Terora dewletê ya li Pasûr-Licê û faciâ Bakirkoyê



Xelkê herêma Pasûrê derket ser rîya Pasûr û Mûşê. Leşkeran devê tîvingên xwe kirin sînga xelkê ew dan ber gullan.

□ Li Pasûr û li Licê leşkeran gulle li xelkê reşandin û 16 kes kuştin. Serokên Tirk wek her car li hember vî ciyanetê jî dîsa bê deng man. Lê bûyera Bakirkoyê jî bo propagandeyên xwe yê nîjadperest pîr baş bi kar anîn û gelê Tirk li hember Kurdan tahrîk kirin.

Roja 24'ê mehê jî bo rakirina cenazên du şehîdan xelkê herêma Pasûrê derket ser rîya Pasûr û Mûşê. Leşkeran berê tîvingên xwe dan koma xelkê ew gullebaran kirin. Her di eynî rojê de li Pasûr û li Licê jî leşkeran xelk dan ber gullan. Di van her sê bûyeran de 16 kes mirin, bi dehan kes birîndar bûn û bi dehan kes hatin

girtin.

Ji bo protestoya vî bûyerê xelkê Kurd li Licê, Pasûr (Kulp), Qezê (Kiziltepe), Dêrik, Kerboran (Dargeçit), Herzex (İdil), Midyat, Bismil, Silîva, Hezo (Kozluk), Kurtalan, Cizîr, Nusêbîn, Silopî,

Dûmahik: r. 11

Yekîtiya Sovyetan ket nav rûpelên dîrokê



□ Gorbaçov bi kirinên xwe him sosyalîzm, him Yekîtiya Sovyet û him jî xwe xîst nav rûpelên dîrokê. Lê gelo dîrok wê wî efû bike, ya neke, îro ev ne diyar e.

□ Yanzde Komarên Sovyetê bi navê "Civata Dewletên Serbixwe" (CDS) yekîtiyek nuh ava kirin. Sîstema YKSS jî holê rabû.

Piştî biserneketa darbeya 19'ê Tebaxê îcar li dijî Gorbaçov darbeya "sivîl" ya 8'ê Çileyê Pêşîn çêbû. Serokên sê dewletên Slavî (Rûsya, Ûkrayina û Rûsya Sipî) ku ji 4/3'ê nufûsa Sovyetê teşkîl dikin, li paytaxtê Rûsya Sipî civiyên û serxwebûna xwe îlan kirin û yekîtiyê çêkirin. Bi vî hawî Gorbaçov ket rola serokê bê dewlet.

Komarên din yê Sovyetê ku wan jî di sala 1991'ê de serxwebûna xwe îlan kiribûn, li yekîtiya sê dewletên Slavî germ nihêrin. Bi vî hawî yanzde komarên Sovyeta kevn; Rûsya, Ûkrayina, Rûsya Spî, Moldaviya, Kazaxîstan, Ozbekîstan, Turkmenîs-

tan, Kirgîzîstan, Ermenîstan, Azerbêcan û Tacîkîstan di 21'ê Çileyê Pêşîn de li paytaxtê Kazaxîstanê li Alma Atayê civiyên û bi navê "Civata Dewletên Serbixwe" (CDS) yekîtiya xwe ji cîhanê re îlan kirin û YKSS'ê jî holê rabû. Gurcîstan beşdarî Civatê nebû, sê dewletên Baltîk; Estoniya, Letonya û Litvanya jî berî çendekî serxwebûna xwe îlan kiribûn û jî Sovyetê veqetiyabûn.

Piştî îlankirina Civata Dewletên Serbixwe jî serokê Yekîtiya Sovyet yê kevin Mixail Sergevîç Gorbaçov re tenê îstîfa mabû.

Dûmahik: r. 11

Rojeva Mehê

Nîşanên Durûtiya Hukumetê

Hukumeta Tirk a nuh, gava hat ser hukum, di programa xwe de da xwiyakirin ku wê çiyekî giran bide reformên demokratîk û bicîhkirina maf û azadiyên civakî. Pirsra Kurdî, li gor programê, xwedêgiravî li ber destê hukumetê wê xwedî giraniyeke mezin bûna û di dereca herî pêşîn de bihata. Hukumet li hebûna Kurdan resmî mukir hat û soz da ku bi riyên aştî û demokratîk li ser çareserkirina meselê raweste.

Mesela reforman û bi taybetî soza çareserkirina pirsra Kurdî, hêvîne mezin di raya giştî ya hundurîn û derve de peyda kirin. Hewak bihnedêr û dilxweşkir di piraniya civakê de rû da.

Lê sê bûyerên ku di vê meha dawî de rû dan, nişan dan ku rastî ji program û sozan cihê ye û hê gelek jê re divê ku em karbin bi dilxweşî bihna xwe vedin. Ji van bûyeran yek jê bûyera li ser rîya navbera Qulp û Licê ye ku eskeran rê li ber xelkê meşvan ê sivil girtin, ew gulebaran kirin û 16 kesên sivil ên bêçek û bêguneh di cih de kuştin. Bûyera duduyan a Stenbolê bû ku hin meşvanên xort ên terefدارên PKK'ê agir bi dikana birayê waliyê herêmî xistin û agir belav bû bi hemû binayê ket û bi biraziyê walî re gelek kesên karkir ên bêguneh tê de şewitîn, mirin. Bûyera sisyay ji civîna Meclîsa Tirk bû ku bi navê "Bûyerên Rojhilat û Rojhilata Başûr" li ser pirsra Kurdî hat lidarxistin.

Şêla hukumetê li hember her du bûyerên pêşîn û di civîna meclîsê de, beyan û biryarên serokwezîr û wezîran, yê generalên eskerî û gavên ku ji bo wan bûyeran hatin avêtin, qet bi program û sozên hukumetê re li hev nakin.

Hukumet ji bo ku reaksiyona dewleta Tirk li hember bûyera Stenbolê nişan bide, girîngiyek berbiçav da beşdarbûyina merasîma cenazan. Serokwezîr, wezîr, serokên partiyên, endamên meclîsê, generalên eskerî û burokratên giregir hemû di merasîmê de beşdar bûn. Hêrs û xezêba xwe hemû bi yek devî di rîya kamera û mikrofonên radyo, televizyon û rojnaman re nişanî hemû cihanê dan. Gava ev êrîş protesto kirin, agir ji dev û çavên wan dibarî, generalan soz dan ku wê xwîna wan li erdê nemîne, tola wan were hildan. Meriv baş didî ku kuştî û merivên kuştîyan ji wan in, dil û hînavên wan bi wan dişewite. Baş xwîya dibû ku xwedî li yê xwe, xwedî li xwe derdikevin.

Lê li hember cinayeta li ser rîya Qulp û Licê qet agir ji dev û çavên tu giregirekî dewletê nebariya. Herçî di rîya ne resmî re xwîya bû ku eskeran bi bêemrîya hukumetê û ya meqamên sivil ev barbarî kirine jî, di sa xistin hustuyê "terorîstan" ku xwedêgiravî wan esker tahrîk kirine. Ji hukumetê û giregirên dewletê kes neçû merasîma cenazên Kurdan, beyanên li ser hildana tola wan nehat dayîn. Xwîya bû, ev ne ji wan bûn, dilê wan bi van kuştîyan nedîşewitî, zêdetir çiv didan xwe ku çawa mazeretan ji vê barbarîyê re bibînin. Nedixwestin eskerê eskerên xwe sîdcar bikin.

Civîna Meclîsê jî ji vî alî de balkêş bû. Civîna hê ji destpêka avabûna hukumetê li ser daxwaza hukumetê ketibû rojva meclîsê. Xwedêgiravî wê munaqêşe li ser awa û rê û dirbên çareserkirina pirsra Kurdî bûna ku wan navê "pirsra Rojhilat û Rojhilata Başûr" lê dikir. Civîna rojvê piştî bûyera Stenbolê dest pê kir. Lê seyr e ku tu tekîliya axaftinên partiyên û yê endamên hukumetê bi çareserkirina pirsê re tunebû. Wek ku ji berê de hatibû plankirin, ki rabû ser kursiyê, behsa wê yekê kir ku wê çawa "terora" Kurdan û tevgera "cudaxwazan" bipelêxin, wê çawa yekîtiya welêt û millet ji xetera perçebûnê xelas kin. Behsa zulma li ser Kurdan, bindestî û bêmafîya wan hema bêje qet nehat kirin. Bahsa teror-îşkence û qetlîamên eskeran hat bincilkirin. Yekî Kurd ku xwest di vî warî de çend gazinan bike û piçekî ronahiyê berde ser rewşa tarî û dijwar a gelê Kurd jî, çend endamên meclîsê ên Tirk, bi eşqiyatî êrîş birin ser kursiyê meclîsê û yê Kurd bi darê zorê ji kursiyê daxistin. Meclîs bû qada xwepêşandana yekîtiya millet û dewleta Tirk li hember daw û doza Kurdan.

Ev hersê bûyer û rewşa hukumeta nuh li hember van hersê bûyeran baş nişan didin ku di mesela çareserkirina pirsra Kurdî de dibê ku ji alî taktîk û rê û dirban de ev hukumet ji hukumetên din cihêtir e. Di beyanên xwe de zêdetir devnêrmîk û dilovan dixuyê, lê di armançên xwe yê esasî de tu ferqa wê ji hukumetên berê tuneye. Ew jî wek wan li wê rîyê digere ku çawa rê li ber "terorê" û "cudaxwaziyê" bigre, çawa yekîtiya welêt û millet biparêze, ne ku çawa pirsra Kurdî çareser bike, rê li ber bindestî û bêmafîya Kurdan bigre. Li gor vê hukumetê jî ew û yê wan yekîtiya millet û dewleta wan heye û em hene. Ew hemû li alîkî û em li alîkî ne. Ew wek ên xwe li me nanihêrin, qîmetê nadin mesela maf û azadiyên me û qet ne di bîra wan de ye ku divê em ji qasî wan xwedî maf û azadî bin. Li ber çavên wan ji xwe curmek mezin e ku em behsa serxwebûn û azadiya milletê xwe bikin, qet nabe ku em bibin hermewelatîyekî qasî wan bi maf jî.

Nexwe divê em zû bi zû xwe nexin xemsarî û hêviya wê yekê ku rojên rohnî û xweşî wîha zû bi zû, bi rehetî, li gor beyan, program û sozên vê hukumetê li me hîlên. Divê em bi israrî xwe bispêrin rewşê û taqeta xwe, baweriyê bi wê binin û bêrawestan muhawele bikin ku, rewş û taqeta me çêtir, zûtir û hêsantir me ber bi azadî û rojên xweş ve bibe.

Berpîrsê Giştî yê Rojnamê Eşref Okumuş
"Kadro wê qedera Rojnamê tayîn bikin"

29'ê Çileyay Pêşîn, roja yeksemê li hemû bayîyên Turkiyê û Kurdistanê rojnameke ji serî heta binî bi Kurdî dihat firotin. Navê rojnamê **Rojname** bû û li serê "Hejmaray Prowayê, Sal 1, Hejmar 0" hatibû nivîsandin. Li gorî berpîrsiyarê Rojname'yê piştî du-sê rojan li Dîyarbekirê, Mêrdînê, Hekarîyê, Batmanê, Nisêbînê, Kiziltepê, Farqînê, Sêrtê û li Şîmaxê Rojname qedîyabû.

Rojname bi îzna resmî, di çapxana "Adalar Gazetecilik, Yayincilik Matbaacilik ve Ticaret Ltd. Şti" de 70 hezar hatibû çapkirin û bi rîya "Bîrleşik Basın Dağıtım A. Ş" e ji hemû bayîyên Turkiyê û Kurdistanê re hatibû şandin. Li gorî mesûlên Rojname'yê, wê hê 100 hezarê din jî bê çapkirin û belavkirin.


XELK DIPİRSE, KA EM ÇI BIKIN

Li gor Eşref Okumuş xelkê di du rojan de Rojname xelas kir. Lê gelo xelkê çî got, çî fikirî, çî eciband, ji çî hez kir? Me ev yek ji her du redaksyonên Rojname'yê, ku yek li Swêd e û yek jî li Stenbolê ye, pirsî.

Ahmet Zekî Okçuoglu dibêje "Bi rastî me ev eleqê ev germayî nedîpa. Me texmîn dikir ku wê xelkê jê hez bike, lê ne bi vê ecêbê" Li gor Okçuoglu, li Stenbolê û li İzmirê erebeyan (seyar saticî) di nava xwe de ji bo "Rojname" yê pere dane hev, li Batmanê xelkê jî ber xwe ve komîta alîkariya Rojnamê damezrandîye. Xelk misêwa dipirse, ka em çî bikin, em çawa dikarin alîkariyê bikin? Mamostekî ji Dîyarbekirê telefon kirîye, di telefonê de girîyaye. Ji Stenbolê jinikekê telefon kirîye gotîye, min rojnameke bi Kurdî ji bayîkî Tirk kirî, ez pîrr bextiyar im, gelek sipas dikim.

Okçuoglu dibêje, xelk xeberên li ser sporê jî hev re dixwînin û hîrr hîrr dikenin: "Xeberên wekî 'Goşt derket 31 hezarî', 'Nîsk ji % 10 buha bûn' jî xelkê re wekî nivîsên mîzahê tîn. Hinek telefon dikin, dibêjin me xaçepirsa we tije kir, lê me ji falan tiştêk dermexist, hinek dibêjin vîya Zazakî nîne, hinek ji bo rûpelên Zazakî sipas dikin, hinek dibêjin we çîma kelîmên Tirkî û Erebbî bi kar anîne, hinek dibêjin seheta we xweş be, we tam zîmanê ku em pê dipeyivin bi kar anîye. Em ji heqê telefonan demakevin. Bi şev û bi roj telefon tîn. Me nuha yek sîrf ji bo bersîva telefonan bide, girîyê. Hêdî hêdî mektûb jî tîn. Mektûbên pîr enteresan hene".

Em ji Eşref Okumuş, mesûlê giştî yê Rojnamê dipirsîn, ji wê



Mesûlê giştî yê Rojnamê Eşref Okumuş dibêje forma rojname Swêdî "Aftonbladet" ji Rojnamê re xweş tê.

re jî tu telefon tîn?

Ew jî dibêje: "Mesela wê rojê ji Stenbolê keçikeke tehsîla huqûqê dike telefon kir got, ez dixwazim digel sipasên xwe bêjim haya we jê heye ku we di vî warî de şoreşeke pîrr mezin kir, destê we ter bin, hûn her bijîn. Di sa xortekî ji huqûqê name şandîye dibêje, heqê we tuneye hûn rojnamê bidin sekinandin, çûnkî wê çaxê kes namîne ku ez bi Kurdî name jê re binivîsînim". Em ji Eşref Okumuş re dibêjin, hûn dibêjin alaqaqeyek mezin ji Rojnamê re hatiye nişan dan, lê him te him jî A. Zekî Okçuoglu di nivîsên xwe de we ew hêvî nedaye xelkê, ma gelo hûnê karibin dom bikin? Li ser vê pirsra me E. Okumuş dibêje ku hevalên Weşanxana Mezobotamyayê û Weşanxana Doz li hev kirine ku şirketekê deynînin û senedê hissê bifroşin da ku ew şirket fireh bibe. Ezê jî di nêzikê de vegerim welêt. **Hesabê me ew e ku di Newrozê de emê hejmarayekem derxin.** Piştî hejmarayê ya provayê me dît ku pere tê peyde kirin. Lê yê ku îro qedera Rojnamê tayîn bike ne pere ye, kadro ne.

Li ser pirsra me ya ku we bi zanîna zîmanê xelkê tercîh (Rojname di şûna herfên I û Î de herfên I û Î bi akr anîye) kirîye û

hûn ji zîmanê xelkê çî fehm dikin E. Okumuş dibêje ku "wexta ku ez dibêjim zîmanê xelkê ez bahsa zîmanê diya xwe yan jî taxeke Farqînê dikim. Wek nimûne xelkê ji gotinên "girîng" û "qedexê" fehm nake. Mesela rojname Tirkî Cumhuriyet çi qasî Turkiyeye safî ye dixwazim Rojname jî hewqasî Kurdiyeye safî be.

Li ser herfan jî E. Okumuş dibêje berê ku Kurdên Turkiyê bîn Ewrûpayê herfên I û Î wek yê Tirkan dinivîsandin. Mesela wê demê kovara yekem ya bi zîmanê Kurdî "Tîrejê" bi van herfan dinivîsand. Îro jî li ser hin herfên Kurdan munaqêşe hene. Lê lazîm bû me herf bi hev re biguhera. Di vî warî de hinek "bîna" anarşîstiyê ji Rojnamê tê. Pirsra me ya dawî ew bû ku di hejmaray provayê de hinek kes sê yan jî çar nivîsên wan hebûn vê yekê jî întubayeke xweş li ser xwendevan nehiştiye. Di vî warî de E. Okumuş dibêje me ji hin kesan nivîs xwest, lê mixabin nedan me. Ji alî din jî wexta me tunebû ku em yeko yeko bi însanan re xeber bidin. Nivîsên ku ji me re ji Turkiyê hatin xeynî ya Mûsa Anter hemû bi Tirkî bûn, me ew wergerandine Kurdî. Yanî ez şêş mehan li ser vê Rojnamê xebitîm.

Redaksiyon: M. Elî, Zînarê Xamê, Hesen Mîzgin, Mîrza Bextiyar, Lewendî Firat, S. Rêving, M. Lewendî
Redaktorê berpîrsyar: M. Elî
Berpîrsiyarê beşê Dimilkî: Malmîsanîj

Adres: Armanç
P. Box: 152 16
161 15 Bromma
Sweden

Telefon: 46-8-803195
Telefax: 46-8-801825

Ansvarigutgivare:
Kurdîska Demokratîska
Arbetar Unionen
Postgö: 50 37 99-9
ISSN: 0345 7385

Kamyona solan ji destê gumruka Tirkîyê filitî

Tixtorên Swêdî (Lâkarmissionen) di navbera rojên 11-15'ê Çileyê Pêşîn (11-15.12.91) de li bajarê Stockholmê kampanyeke civandina solan ji bo Kurdên başûr amade kir. Tevî ku gotibûn kampanya wê bes du roj be jî, lê ji ber pîrbûna alîkariyê û daxwaza millet a zêde, kampanya 5 rojan hate domandin.



Di nav 5 rojan de 60.000 cot sol hatin civandin

Li gor agahdariya ku me ji berpirsiyarê Lâkarmissionen, Birge Toresson girt, di nav 5 rojan de 60.000 cot solên biçûk û mezinan civandine. Û di roja 17'ê Çileyê Paşîn de bi 3 TIR'ên mezin şandine Kurdistanê.

TIRKAN DEST DANÎN SER KAMYONA SOLAN

Di rê de, li gumruka Xabûr, Tirkan dest danîn ser kamyona solan, xwestin nivê solan ji Hêva Sor a Tirkîyê re bihêlin. Ev mudaxela Tirkan bû sebeb ku kamyon çend rojan dereng bigihîje ciyê xwe.

Li gor agahdariya mesûlekî Lâkarmissionen sala çûyî li ser hev 7 kamyonên mezin kinc û sol ji Kurdên Iraqê re hatine şandin û ji bo şandinê 250.000 kron mes-ref kirine.

17 û 19'ê meha 12'an de ji bajarê Halmstad'ê 3 kamyon kinc û sol, ji Almaniyayê 3 kamyon bataniye, ji Danîmarkayê 3 kamyon betanî û kinc şandine Kurdistanê. Herweha 519 700 Kron pere wek alîkarî hatiye şandin.

■ Dîsa Xaçê Sor a Swêdî di

Cepha Kurdistanana Iraqê Biryara hilbijartinên giştî da



Seroktiya Cepha Kurdistanana Iraqê ji bo pêşketina Kurdistanê û munaqesheyên li ser vê di 15'ê Çileyê Paşîn de (15. 12. 1991) civînek pêk anî. Di civînê de biryar hat girtin ku di buhara 92'an de li Kurdistanê hilbijartineke giştî bête çêkirin.

Bi vê riyê Cephe dixwaze ku gel bi rengekî azad berpirsiyarên xwe hilbijêrin.

Ji bo hilbijartina pêşî Cephe sistemeke plûral ji xwe re qebûl kir. Ew şexs û partiyên ku wê têkevin meclîsê divê di hilbijartinan de ji %7'ê dangan

bigirin.

Ji bo hilbijartinan komîteyêke pisporan hat avakirin. Ev komîte wê projeyekê ji bo hilbijartinan amade bike. Li gor biryara Cephê, eqeliyeten -hindikayiyên- wek Turkmen û Asûriyan jî di Meclîsa Kurdistanê de wê bîn temsilkirin.

Her wisa Cephê biryar da ku parlamenter û heyetên biyanî jî ji bo çavdêriya hilbijartinan bîn vexwendin.

Di beyana PDK-I de tê gotin ku ev biryaren Cephê nayê maneya sazkirina idareyêke serbixwe, ya jî derxistina alternatîfe idarî li hember hukûmeta Iraqê. Bi van biryaran armanc ewe ku Cephe bikaribe hîn qanûn derxe û bi raya gel guftugoyên otonomiyê bi hukûmeta Iraqê re bimeşîne.

Li alî din biryar hat girtin ku hata mumkun be wê hêzên pêşmergan bêtir bi ser û ber bibin, têkevin bin dûzan û kontrolê.

Ji redaksiyona Armancê re

.....Pistî hejmara 116'an tu hejmareke Armancê negihîştîye destê me. Em li vê derê nêzi 500 Kurd in. Em bi xwîngermî li hêviya rojname, kovar û belavokên Kurdî ne.

... Li gor nêrina me Armanc di warê hunerî de hinekî li paş e. Bi taybetî jî alî karikaturan ve. Çimkî dibe ku herkes nikaribe hemû an jî

gelek nivisan bixwîne, lê carna karikaturek dikare şûna gelek nivîsên hunerî tîji bike.

Ji ber wê yekê ez dipirsim, "çima Armancê ji karikaturan bê par e?"

Gelek silav ji hemûyan re.

Eli Şemdîn
Trablus / Lîbya

NEYNİK

Sê wêne ji sala bihurî

Bavê Nazê

SALA ME li ber çûyîne ye, bi nexweşî û xweşiyên xwe ve derbasî dîrokê dibe. Sala nuh jî li ber deriyên e. Ji sala çûyî çend wêne, di mejiyê min de ne û her carê mîna rew-rewkan li ber çavên min diçin û tîn...

Helbet wêna mîletê ku ketiye ber pek û şegan, ne di qanê de ye. Ew maka nexweşiyê ye û hemû derd û kul jê dertên. Ji ber vê yekê ev heya nexweşiya wê neyê dermankirin, wê ji rojan derbasî mehan û ji mehan derbasî salan bibe. Wê heya-heya li ber çavan be û di dil, wijdan û hişan de be. Di vir de, ezê li ser wêneyên taybetî yên şexsan binivîsim.

WÊNÊ YEKEM, yê Siloyê bist û çend salî ye ku xwe kuştîye. Wî xwe kuşt û me rê li ber negirt. Erê, roj li nivê rojê, Silo weris xiste hustiyê xwe û ji ber xeyda ji duniyayê, bar kir û çû. Ew ji xwe jî xeyidî bû, çimkî karê ku diviyabû bikira, nebîr serî. Ew ji me xeyidî bû, ji ber ku tiştê ji destê me dihat, me jê re nekir. Û wî xwe kuşt...

Tiştêkî seyr e, li gel mirna Silo ya tirajedî jî, lê her bişirandina wî li ber çavên min e. Baweriyek wîlo bi min re çêdibe ku wî bi bişirandinek li ser lêvan, berê xwe da xwekuştinê. Çimkî devekî li ken bûbû perçak ji dimenê wî. Bixwe, gava cara pêşî min ew nas kir, bi taybetî vê rewîştê bala min kişand. Lê belê, listika wî bi rola birîndarê Helebçe yê li ber mirinê, hîn bêtir li ber çavên min e. Tê bîra min, jî-neke Rûs a li pêşiya min rûniştî, destê xwe avête ser çavên xwe û bi dengêkî bilind, çend carî li pey hev got: "Xwedêwo, îca ev çi ye?"

Ma ne çi bû? Ew perçak ji jiyana me Kurdan bû. Ew wênek biçûk ji tirajediya mîletê Kurd bû û cara pêşî li ser sehnê hatibû listin. Gelo Silo wê bikarîba, bi çend rolên wiha rabûna? Rola wî ya xwekuştinê rola wî ya dawî bû. Lê çima wî, xwe dûrî çavên temaşegeran kir û xwe di odak biçûk de, daleqand? Çima xizmeta dawî ji bo mîletê xwe nekir û li meydana bajarekî Ewrûpî xwe nekuşt? Çima gelo? Çima?

WÊNÊ DUYEM, tevî ku min bi çavên xwe nedîtîye, lê her di xeyala min de ye û li ber çavên min e. Ev wêne bêbextiya Serdarî bi hevalê wî re ye. Erê ew Serdarê ku li ser navê şoreşgerî û welatperweriyê li derveyî welat dimîne, ji bo qirêja mate-destan (çend dolar jê hatibûn dizîn), hevalê ku bi salan pê re dijîya, gunehkar kir. Wî destpêkê tehdîd bi awakî nivîskî jê re şand: "Heger tu pera li min venegermî, ezê suretê te li sefaretê dewletên Ewrûpî belav bikim, (Ew heval li ser rîya çûna dewletek Ewrûpî bû) ezê fakultê pê agahdar bikim û di vî warî de ezê namakê ji dergistî û mirovên te yê li welêt re bişînim. Diyar e nivîsê tîna Serdarî neşikênand, ew çû û gazî polis kir. Bi vê yekê bêtî ku ispata dizîya pera li cem hebe, tuhme xiste hustiyê hevalê xwe û ew bê rûmet kir. Polis jî muhleta çend rojan da belengaz, da ew pera li Serdarî vegeirîne. Lê jî kû? Lê wiha bû û Xwedê rûyê Serdarî reş kir û dostika wî li ser vê yekê li xwe mikur hat û pere li efendî vegeand.

Piştî vê yekê, gelo wê heqê Serdar (navê Serdar piştî derketina ji welêt li wî mirovî bûbû) hebe ku ciyê xwe di nav welatparêzan bigre? Gelo kesê bikaribe hevalê xwe bifroşe, wê nikaribe welatê xwe ji bifroşe?

WÊNÊ SÊYEM e jina Ûris a navsere ye. Wê destê xwe yê lerizî û terikî şanî xelkê dida û digot: "Ji ber karê xwe ez nexweş ketime. Rojekê min, xwe ji ber kar neda alî. Min digot çawa be, wê rojekê bê û emê bi jiyana xweş şa bibin. Heger em nebin jî, de bila zarok û nevyên me bin. Lê niha ez çi dibînim? Xortanî çû û nema vedigere... Spehîbûn ji min wînda kir, êdî ez nema ji kesî re dibim. Û du sed Rûbilên niha, wê çi xweliyê li serê min kin? Heyf e, de xwezî min qehpetî bikira!"

Sê wêneyên rengo-rengo ne. Her yek ji wan bi awakî min diêşîne. Lê êşa bêbextiya Serdarî bi hevalê wî re, êşa herî dujwar e... Tiştê ku di destê min de ma ye ev daxwaz e: De bila sala me ya nuh bêtî bêbextiyê derbas bibe!

RAMANÊN RAMANWERAN

Hesen Mizgîn li ser dara sêvê li hirmiyên digere

Haydar Diljen

Di hejmara Armançê ya 121'ê de bi sernivîsa "Armanç û Sansur" nivîseke Hesen Mizgîn hat weşandin. Ez bi detayên munaqeseyên di navbera wî û redaksiyona Armançê de derbas bûne nizamim. Ji bo vê yekê jî di vî warî de naxwazim tiştêkî bibêjim. H. Mizgîn di hin îddîyên xwe yê di derheqê maziya me de bê wijdan e û hetta di tewrekî xwe înkarkirinê de ye. Ji bo vê yekê jî ez dixwazim di vî nivîsê de li ser vî aliyê nivîsa H. Mizgîn rawestim.

H. Mizgîn dibêje: "Li gor redaksiyona Armançê, nivîsa min tiştên anormal tîne zimên" (...) "Li gor hevalan divê ez nebêjim ku me kadirên xwe helandin an jî me nehişt ku abûqatek, doktorek, nivîskarek, mamosteyekî bi rêk û pêk ji me derkeve". Bi dîtina min jî ev "fîkrên" H. Mizgîn ne di warê şikil de û ne jî di warê naverokê de normal in; hetta îftira ne. Lê bi weşartinê tiştên anormal ji holê ranabin. Ji bo ku anormaliya wan bête fêmkirin divê mirov tiştên normal bide hember wan. Loma jî divê redaksiyonê nivîsa H. Mizgîn çap bikira. Bi ya min li ser do, îro û pêşeroja tevgera gelê Kurd a netewî kî çî difikire, divê bikare bibêje. Bi taybetî jî kadir û kesên ku di xebata siyasî a Kurdistanê de xwedî îddîa ne divê bikarin fikrên xwe bi rengekî vekirî bibêjin. Bes bi gotinê jî nemînin divê li gor bîr û baweriyên xwe xebatê bikin. Ji ber ku hewcedariya tevgera Kurd êdî ne bes bi hekem û temaşevanan, bi kaptan û îstikvanên jîr heye.

Dema ez li maziya me dinêrim, ez dibînim ku me gelek tiştên baş kirine; ku gelê me wê îro jî û sibê jî karibe jî wan feydeyê bibîne. Lê li alî din me gelek tiştên şaş jî kirine. Sedemên van şaşiyên me rewşa dinyayê û ya welatê me ya wê demê û kêmtêcrûbetiya kadirên me bû. Lê H. Mizgîn bi vî rengî li meselê nanêre, ew, her tiştê ku me kiribû înkâr dike. Ev yek ne xwe guhertin e, xwe wendakirin e.

TÎRÊJ, PÊŞENG, JÎNA NÛ Û...

Di warê çapemeniyê de jî tiştên H. Mizgîn gotine ne rast in. Cara pêşîn, di sala 1979'an de bi navê "Tîrêjê" kovareke temamî bi Kurdî -bi du zaryan- me derxistiyê.

Me di sala 1977'an de dest bi weşana Pêşengê, di 1978'an de, bes ji bo ciwanan, dest bi weşana kovara "Devrimci Demokrat Gençlik", di 1979'an de dest bi weşana Jîna Nû, di 1980'î de ji bo munaqesekirina pirsên hîndekariyê, bi taybetî ji bo bilindkirina şîara hîndekarî û perwerdekirina zimanê zikmakî dest bi weşana kovara "Demokratik Eğitime Doğru" (Ber Bi Hîndekariya Demokratik) kir. Baş e, ji bo derketin û xwepêşdebirina nivîskarên baş" ma ev ne îmkânên hêja ne? Gelek kesên ku îro di vî warî de ya jî di wî warî de bûne nivîskar, rojnamevan û hwd. H. Mizgîn jî ji wan yek e) ma ne berhemên vê xebatê ne? Ev yek çawa dikare bibe rêlibergirtin?

Me di dîroka Kurdistanê de cara pêşî di sala 1979'an de federasyoneke jinên Kurd ava kir. Ew kesên ku îro li Ewrûpayê bûne terefdarên jinan wê demê tinazên xwe bi me dikirin. Ev komele di warê program, destûr, metod û perspektîvên xebata xwe de gaweke gelek bi pêş de û girîng bû. Loma jî bala dijmin kişand ser xwe û hat girtin.

XEBATA MAMOSTAN Û DÎROKA KURDAN

Ji bo ku mamosteyên baş derkevin me rûmeteke mezin daye xebata di nav mamostan de. Tesîra me ya li ser şubeyên TOB-DER'ê (Komela Mamosteyan) vê yekê îspat dike. Hîn wê çaxê me haziriya hîndekariya bi Kurdî dikir. Ji bo ku mamoste nedin pey sloganên û di karê xwe de xwe bi pêş de bibin, bi ankêtan me kêmasî û hewcedariyên wan tespît dikirin û li gor netîceyên ankêtan ji wan re semîner hazir dikirin. Her wiha li Enqerê, di kongreyên TOB-DER'ê de jî ji 1975'an û vir de me mesela Kurd û daxwaza hîndekarî û perwerdekirina Kurdî tim aniyê zimên. Ji bo vê yekê jî pirê caran em li der gelek îtifaqan mane, lê me ji mesela xwe ya netewî tu carî gav bi paş de neavêtîye. Û me gelek caran rastiya welatê xwe di kongrên wan de bi wan daye qebûl kirin. Kesên ku ev xebat dikirin ji wan yek jî H. Mizgîn bû. Îcar mirov çawa dikare bibêje "me nehiştîye mamosteyekî bi rêk û pêk ji me derkeve"? Piraniya mamosteyên ku wê sibe li Kurdistanê hîndekariya netewî damezirînin û bimeşînin dîsa wê ew bin. Ji wan yek jî H. Mizgîn e.

Ev yek ji bo doktoran, abûqatan, muhendîzan jî weha ye. Ku mirov li Diyarbekirê, li

serok û endamên komîteyên karger ên Komela Mafê Mirovan, Baroya Abûqatan, li organîzasyonên muhendîsan û yd. binê mirovê bi hêsanî vê rastiye dibîne. Gelek kadirên me yê kevin îro ne bi me re bin jî lê hema hema tamamiya wan di nav platformeke welatperwer de, di nav tevgera Kurdî de ne. Ev yek ji bo me serbilindiyê mezî e.

EM DO JÎ BI MÊJIYÊ XWE KURD BÛN Û ÎRO JÎ

Me di sala 1979'an de, di hîlbijartinên senatoyê de rewşa Kurdistanê ya wê rojê, çareserkirina pîrsa Kurdî di televizyona Tirkîyê de bi axaftina Ganî Sungur anî zimên. Îddîa ku "Kurd cara pêşî li ser navên xwe bi hîlbijartinê 1991'ê beşdarî hîlbijartinê bûne" ne rast e. (Ev ne îddîa H. Mizgîn e). Wê demê şert ji yê îro gelekî girantir bûn, lê em dîsa neketin bin şemsiya partiya Mustafa Kemal. Di dîroka me de rûpelên weha jî hene û heqê her hevalê me heye ku bi vê serbilind be. Ez bawer nakim ku bêyî H. Mizgîn hevalêkî me yê din rabe bibêje "heta du sal berê ez ne Kurd bûm". Em do jî bi mêjiyê xwe Kurd bûn û îro jî bi mêjiyê xwe Kurd in.

EZ ÎRO JÎ SOSYALÎZMÊ DIPARÊZIM

H. Mizgîn dibêje, "li gor hevalan divê ez nebêjim ku em berî her tiştî dîroka xwe fêr bibin. Divê em dîroka xwe munaqesê bikin; ne Stalînzîmê, Lenînzîmê" û hwd. Li vir ez dixwazim diyar bikim ku min fikrên sosyalîst do jî diparastin û îro jî diparêzim. Lê sosyalîzmeke çawa? Li Kurdistanê do jî hewcedariya fikir û organîzasyonên sosyalîst hebû, îro jî heye û wê sibe jî hebe. Bi ya min azadiya gelê Kurd a rastî girêdayî biserketina sosyalîzmeke plûral e. Bûyerên hin welatên sosyalîst, li Ewrûpayê şerpezetî û gêjbûna hin kadirên Kurd, şablontiya do û ekstremîstiya hin kadirên wek H. Mizgîn vê rastiye jî holê raneke. Lê bi taybetî di mesela partyê û di mesela politîka aboriyê de bê guman divê sosyalîzm xwe nuh bike

WEŞANXANA JÎNA NÛ, ARMANÇ Û DÎROKA KURDAN

Weşanxana Jîna Nû heta nuha 23 pirtûk çap kirine. Ev

Stiriyên me

Lawikê Berrivani

Ez bi Kurdiya naylon nizamim

Piştî hejmara Armançê ya 121'ê du nameyên rexnegirî ji me re hatin. Xwediyên her du nameyan jî li zimanê min û Armançê rexne girtine. Li gor wan, di Armançê de gotinên Erebi pir in û bi taybetî jî zimanê min ne paqij e, ez gotinên Erebi zêde bi kar tînim.

Ji xwediyên nameyan yekî navê xwe nivîsî ye; Ahmed Cantekîn. Yê din xwe eşkere nekiriye, piştî barek gotinên ne di cî de, gotiye "xwendevanekî we".

Ahmed Cantekîn tenê ne li zimanê min, her wisa li "Stiriyên me" jî rexne girtiye; him jî bi du karîkatorên min. Di namê û karîkatoran de îddîa wî ew e ku xwedîgiravî berên stiriyên min tim bi xelkê de ne, ez tu carî Armançê rexne nakim, divê ez yekcama berên stiriyên xwe bidime Armançê jî.

Lê belê biraderê Cantekîn ew tiştên ku ew dixwaze ez wan jî rexne bikim bi rengekî ku ez karibim têbigihîjim bi nav nekiriye, zêdetir bi zimanê "çivikan" peyiviye. Çi mixabin ku ez bi zimanê çivikan nizamim.

Herçî gelşên civata me ne, heta jî min tê ez hewl didim ku tu ferqiyetê nexim navbera wan. Lê him hakimî û him jî sawçitî bi hev re nabe, pîrî mumkun e ku ez hin kêmasî û çewtiyan nabînim. Û gava meriv wan nebîne rastkirina wan jî ne mumkûn e. Di vir de vatîniyê mezin dikeve ser milên xwendevanan, divê xwendevan jî bi qasî nivîskar û xebatkarên Armançê li rojnama xwe xwedî derkevin; ji bo Armançê hin baştir dîtînin xwe bibêjin û pêşniyarên xwe ragihînin redaksiyonê.

Nuha jî em werin ser rexneyên "xwendevanekî me". Vî biraderî jî gotiye "her ku diçe di zimanê Armançê de Erebi zêde diibe". Û jî vî îddîa xwe re, wek numûne jî nivîsa min a wê hejmarê (Ma Fikrîguherandin Sûc e?) jî kiriyê û pê re şandiye. "Xwendevanê me" wek lînguîstîkî jî alî morfoloji ve meqala min "baş tetqiq(!) kiriyê; gotinên di meqalê de yek bi yek jimartine. Li gor bextê wî, gotiye 617 gotin di meqalê de hebûne. Dû re di navbera gotinên Kurdî û yê "ne Kurdî" de tasnîfêk çêkiriyê û binên gotinên biyanî xêz kiriyê. Di dawiyê de, piştî gelek hesab û kitab, "tevî tkrar û daçekan" 200 gotin, wek gotinên Kurdî qebûl kirine. Cardin mala wî ava be, ma daxista 100 gotinî minê çî bikira?

"Xwendevanê me" di mesela binê gotinan xêzkirinê de pîrî bi pêş de çûye, hewqas tiştê ne rast, ne di cî de gotiye ku êdî jî ciddiyetê derketiye. Mesela wî binê gotina "melle", "komunîst", "Marksîst-Lenînist", "bela", "ciddî", "welle", "heyran", "civat", "îspat", "Musliman", "şahî", "mîrîd", "îman", "sosyalîst", "ideoloji", "kapitalîzm", "emperyalîzm", "sosyalîzm", "partî", "ordî" û hwd. xêz kiriyê.

Biraderê me bi rexnekirina van jî nehatiye serî, binê navê Stalin û Lowel jî xêz kiriyê. Lê belê ne Kurdiya gotinên jor û ne jî Kurdiya navê Stalin û Lowel nivîsandiye. Nuha ez rebenê Xwedê çî zanim Kurdiya "melle", "komunîst", "bela", "Musliman", "Şahî", "îman", "sosyalîzm" û ya navê Stalin çî ye? Ji bo ku ez di nivîsên xwe de van "gotinên Erebi" (!) bi kar neyînim, divê "xwendevanê me" rojek berî rojekê Kurdiya wan çêke û ji min re bişîne. Û heger navê xwe jî li binî binivîsîne wê baştir be. Mumkûn carna ez me'na hin gotinên Erebi jê bipîrsim. Û divê sondeke di dêla "Welleh" jî ji min re bibêje, çimkî heta meriv sond nexwe kes jî meriv bawer nake.

Ya din, vî "xwendevanê me" ji bo Kurdiyê "xwerû" gelek zor daye xwe. Ji ber vê yekê jî çewtiyê weha kiriyê ku dikane tîkeve quncikê "Hindik û Rindik". Di dereke nama xwe de gotiye, "Pişt re Armanç rojnama kê ye? Xwerîst, ne ya ew kesên ku bi Kurdî nizanin e". Gotina "xwerîst" di dewsa "tabîatiyla" ya jî "dogal olarak" a Tirkî de bi kar aniyê. Lê jî binî de çewt e. Carê, berî her tiştî "xwerîst", xurîst ya jî siruşt; maneya wê ne "tabîatiyle" ye, tabîat e. Hemberiya "tabîatiyle" bi Kurdî "helbet" e, bê guman e, bê şik e.

Ziman dilê miletekî ye, yekî qesab nikane emeliyata dil bike, ji bo vî karî cirahekî dil pêwîst e. Gava wiha nebe merivê wek "xwendevanê me" bixwaze "îmanê" ji millet û "sosyalîzmê" jî ji destê şoreşgeran bigre.


Paqijkirina zimên jî gotinên biyanî tiştêkî baş e, divê meriv bike. Lê nabe ku her kes jî ba xwe ve rabe gotinan çêke, kirinek weha bêmesûliyetî ye, anarşî ye. Ji bo karekî weha zanî divê, pisporî divê. Çêkirina Kurdiyê naylon wê bibe sebeb ku xelk bibêje, "bavo Tirkî çêtir e, qenekê em jî hev fahm dikin".

Ya din jî gotinên biyanî bes alî zimanê me de tunene, di her zimani de bi hezaran gotinên biyanî hene. Tu kes bikaranîna van gotinan yasax nake. Û divê em jî nekin. Û jî xwe gelekên wan êdî bûne malê me.

Ez dizanim di vî nivîsê de jî min gelek gotinên Erebi û Tirkî bi kar anîn; hema navê "Ahmed Cantekîn" jî numûneyek e. "Ahmed" bi Erebi ye û "Cantekîn" jî bi Tirkî ye. Lê bi rastî min kir nekîr, min nikaribû Kurdiya "Ahmed Cantekîn" çêkara. Ji "Xwendevanê me" lêbûrîne dixwazim. Û sala nuha a we hemû xwendevanan jî dil pîroz dikim.

Şeva Armanc'ê


Şahiya piştgiriya Armancê



Nasir Rezazî bi dengê xwe yê xweş reng da şevê



Di 14'ê Çileyay Pêşîn a 1991'an de li 700 kesî beşdarî şeva piştgiriya Armancê ya li Stockholmê bûn. (Foto Armanc)



Gula şevê, nivîskar Mahmud Baksî bû. Wî bi spikeriya xwe temaşevan him kenandin him jî da fikirandin

Di şevê de li ser navê Redaksiyona Armancê axaftina Hesên Mizgîn;

Hûn tevde bi xêr hatin. Ez hêvîdar im ku em bi hev re demek xweş derbas bikin.

Armanc ji roja ku derçûye û heya îro bi tevi kêmasî û tengasiyên xwe gihîştîye qonaxêke hêja.

Xwendevanên me yên hêja, di çare-serkirina kêmasiyên me de roleke girîng listine û ji nuha û pê ve jî em di wê baweriyê de ne ku wê bi namayên xwe yên rexnegirî ve rola xwe ya girîng bidomînin. Armanc, bi xwendevanên xwe û bi redaksiyona xwe hatiye ve qonaxê û hiç jê şik tune ku wê bi wan jî pêş ve biçê.

Em di mihaciriyê de ne. Di rewşeke wiha de, parastin û pêşdebirina çanda me, munaqesekirina pirs û pirsgerêkên me yên civakî, netewî û berî her tiştî jî pêşdebirina zimanê me yê şêrîn vatîneyek pir muhîm e. Di vî warî de em jî di şopa mamosteyên xwe yên hêja Bedirxaniyan de çûn. Me jî di xebata çareserkirina pirs û pirsgerêkên xwe yên civakî, kulturî û netewî di nivîsandina bi zimanê zikmakî de dît. Ji ber vê yekê jî ji hejmarê 62 û wir de Armancê we bi tevayî bi Kurdî derdikeve.

Lê belê weke ku hûn guhdarên hêja jî dikarin texmîn bikin, derxistina Armancê ne hewqas hêsan û rehet e. Hevalên ku di derxistina Armancê de dixebitin, fedakarî-yeke gelek mezin dikin.

Helbet fedakarî bi serê xwe têr nake. Di karê rojnamevaniyê de beşa ekonomiyê yek ji kevirên bingehîn e. Ji bo ku rojnameyek bi awakî periyodîk der biçê, divê di kasa xwe de tim û tim sermiyanê xwe hebe. Di vî warî de em berê xwe didin we guhdar û xwendevanên Armancê. Îro ev şahiya ku em anîne cem hev ji ber tengasiya aborî ye.

Ez dixwazim di hizûra we de spasîya redaksiyona Armancê jî hemû hunermend û dengbêjên ku di şahiya piştgiriya Armancê de beşdar dibin re pêşkêş bikim. Spas ji kek Mehmed Baksî re ku spikeriya şevê dike. Spas ji bo hemû hevalên ku amade kirina şevê de kar kirine. Spas ji Nasir Rezazî, Ciwan Haco û Delal re. Spas ji İsmet û Rodî Cizirî Spas ji Koma Govendê re. Spas ji we guhdaran re ku bi hatina xwe piştgiriya Armancê dikin.

Mesajên ji şevê re hatine:

Kurdistan Press, Berbang, Bergeh, Niştîman, Serokê Federasyonê Wildan Tanrikulu, Reşo Zilan, Komela Karkerên Demokratîkên Kurdistan Stavanger/Norwec, HEVKAR/Almanya, Aligirê HEVKAR li Krefeld/Almanya, Komîta Ewropa ya Partiya Pêşeng ji şevê re şandine.

Rastiya vekirî ya Armancê

Li Swêdê hin daîre û xwendegeh, salê carekê hatina xwe, mesrefa xwe, hejmara personalên xwe, û li ser karên xwe raporekê diweşînin. Bi vî riyê hevvelatiyên ku karên wan dikevin wê daîre an jî xwendevanên li wê xwendegehê dixwînin, di derheqê daîre an xwendegeha xwe de hîn bêtir agahdar dibin.

Ev yek jî bo berpirsiyarên daîrê, rektorîya xwendegehê dibe wek hesab dayînekê. Ji bo xwendevanan, hevvelatiyan jî dibe sedemê pêldayîna hisên şirkatiya xwendegehê, daîrê. Netîce, ji bo her du alîyan jî peyda kirina berpirsiyariya civakî ye.

Ji bo kovareke Kurdî, kovarek ne ticarî, îdiel pêwistiyek mezin e ku rastiya xwe jî xwendevanê xwe re veke, wan jî bike şirkê serkeftin û gelşên xwe.

Em çima ji rastiya xwe bitirsîn? Bêyî hin "propogande"yên bê encam û hin "hesab"ên piçûk çî "feyde" tê de heye. Jixwe, xweşî û nexweşiya rojnameyekê ne tenê girêdayî tîraja wê ye.

Rewşa Armancê;
Tiraja Armancê 1200 e.

Aboneyên me yên li Tirkîyê û li Kurdistanê Bakur 80 heb in, yên li Swêd 255 heb û yên welatên din jî 171 heb in. Û yên ku em li ser hev dişînin derveyî Swêd 298 hebin.

Rewşa aboneyan

Tirkîya û Kurdistanê Bakur	80
Swêd	255
Ewropa Rojava	83
Ewropa Rohilata	45
Amerîka-Kanada-Awustralya	12
Îran-Suriye û Kurdistan	20
Ciyên din	11

Me li jor got abone, lê hun çewt fêmanekin ku ev hemû bi perên xwe bûne abone. Ji abonetiye mebesta me ew kes in yên ku em yeko-yekê Armancê jî wan re dişînin. Ji 255 abonan bes 112 kesî îsal abonetîya xwe dane. Li Almanya 45 aboneyên me hene, ji van bes 15 heban îsal abonetîya xwe dane. (Ew jî abonetîya 11 kesan hevlekî jî redaksiyonê di gera xwe ya Al-

manya de ji dest girtiye). Ji xwe Armancê em dişînin Sovyetê û Rohilata Ewropa belaş in.

Derveyî aboneyan, ew Armancê ku em li ser hev dişînin hin deran jî gelek caran pere wan nayên.

Hatin û çûyina Armancê ya salane

Çûyîn	
Kirê:	60.000
Çap û rêzkerin, rasterîng:	60.000
Poste:	40.000
Zerf, xaxet, sûret û hwd.	10.000
Yekûn	170.000

Hatin:	
Alîkariya Daîra kulturî ya Swêdê	45.000
Aboneti	25.000
Ji firotina destan	5.000
Reklam	7.500
Yekûn	82.500


Armanc her sal li dor 80-90 hezarî di zera de ye. Hemû zera Armancê Weşanxana Jîna Nû dide. Dema îmkânên Jîna Nû jî têr nake, em kedkarên Armancê yan jî berîka xwe didin, yan jî diçin ji nas û dostan alîkariyê dixwazin.

Armanceke bi kalîte


Lê dibû ku rewş ne weha bûya. Îro li Ewropayê ji niv milyonî zêdetir Kurd hene. Û bêyî Armancê tu rojnameyeka Kurdan ya din xurî bi Kurdî tune ye. Nuha bes 1.000 aboneyên me hebûna bêyî ku em muhtacî derekê din bibûna bi rehetî Armancê wê serwebûna aborî bistenda. Heger îro 2.000 aboneyên me hebûna emê wek nuha, di buroya xwe de li hêviya nûçeyên ku yek ji xêra xwe re ji me re bişîne bûna, emê li dûv nûçeyan bigeriyana. Heger îro 5.000 aboneyên me hebûna wê Armanceke hem ji alî naverokê ve û hem jî ji alî şikilê ve ji ya îro bi kalîtetir, xweşiktir û zengîntir derket. Ma Kurd ne layiqî rojnamên weha ne?

Derxistina Armanceke bi vî rengî ne xeyal e. Dema her Kurdekî dilsoz, hizkirên Armancê bibin abone û ji bo ku kesên dora xwe jî bikin abone hewl bidin, wê demê derxistina Armanceke bi vî rengî wê gelek hêsa be.

M. Bextiyar



Delalê bi dengê xwe yê delal şev geş kir



Li ser daxwazên ciwanan Ciwan du car derket sahnê

Gerrek li nav şêrebirîndarên warwêran -IV-

Murad Ciwan

Li Qeladiza Wêrankirî

Piqaba me ji zozanên çiyayê Biye ber bi nişûvî da-dikeve Nawdeştê, xwe digihîne ser cada çîrkirî ya navbera Rewanduzê û Qeladizayê, li deştê em berê xwe didin rojhilat. Li aliyekî zincîra çiyayên Qendîl, li aliyê din Zêrînekêw. Deştê kûr û teng û bi fettok, rê wek marekî reş di nav çiyaran re fettokan dide xwe û diçe. Piştî Nawdeştê, Deştî Şehîdan tê. Ew jî di nav çiyaran de ye.

Piştî demekê em rîya çiyayî xelas dikin û derdikevin deştêka fireh ku jê re Piştder tê gotin. Li aliyê wê yê bakur dewama çiyayî Qendîlê dibin hudûdê Îran û Iraqê û jî dûr ve dixwiyên; li aliyê rojava gola Dukan pingar daye ku bi eslê xwe bendavek e.

Em deşt û deştê diçin. Deştêka rast a zîraî ye. Lê ev deşt jî wek herêmên din ên Kurdistanê, hatiye wêrankirin, gund hatine xerakirin. Erd beyar mane. Kak Qasim bi me re ye, dibêje:

-Berî serhildanê li van deran tu mirov nedihatî dîtin, ji bilî eskeran. Emir hebû ku kî bê dîtin, bê îxtar bê gulebarankirin. Li ser van rîyan hew makinên eskerî diçûn, dihatin.

Lê îro xelkê cardin hatine ser warên xwe. Çadir, kon yan holikên xwe danîne. Li deştê em tîn di nav gundekî re derbas dibin ku hemû avayiyên wê hatine hilweşandin. Kak Qasim dibêje:

-Ev esas du gund in. Yê pêşî piçûk e, Cahşawa ye, yê din nahîye ye, Sengeser e. Em ji Sengesera wêrankirî piştî kişandina hin risman derbas dibin, diçin.

Deştî fire ye, mintîqa çiyayî hê dûr xwiya dike. Ez difikirim ku Qeladiza hê gelek dûr e, li wê herêma çiyayî ye. Lê piştî deh deqîqan ku em li dor girekî difitilîn, li naverasta deştê bajarekî hilweşandî derdikeve pêşîya me. Kak Qasim dibêje:

-Va ye Qeladiza.

Ez carekê din ecêbmayî dimînim. Qeladiza û li deştê? Gava tê gotin Qeladiza bêyî vir de wê de bajarekî çiyayî, asê bi kela û burc di mejiyê meriv de tê rismandin. Lê va ye Qeladiza li deştê Piştder pahn bûye. Em di ser pireke piçûk re derbas dibin û dikevin

derxistine qewirandine, dînamît li stûnê avayîyan girêdane û qeza bi carekê de hilweşandine. Banê xanî û avayîyan hatine, li erdê sekinîne. Niha Qeladizî hatine li ser warên xwe danîne. Hin di holikan de ne, hinan hema molozen bin banê xaniyên xwe malîştine, qulikên wek goran çêkirine û ketine bin wan banên hilweşiyayî yê wek goran. Em di sûka Qeladiza re dajon. Li vî alî wî alî hin holik an xirbe hatine çêkirin û bûne dikan. Lewhe bi wan ve hatine dakirin, ji lewhan meriv tê digihê ku, hin dikanên kirînfirotinê ne, hin lokante ne, berber, terzî û yê din hene. Carina zarokên piçûk wek çêlikên

sawur bike ku miletek tevî ewqas zulm û zorê çawa dikare xwe li ser piyan bigre. Ji Zaxoyê va ye em hatin heta Qeladizayê. Her der hatiye xerakirin, her erd û bax û baxçe hatiye wêrankirin û talankirin. Xwiya ye vî miletî jî talan û wêrankirina rejim pêştir tu tişt nedîtîye. Heta meriv bi çavên xwe ve trajediyê, ve wahşetê nebîne meriv tê nagihîje ku vî miletî di dema serhildanê de çima ewqas avayî û mal û milk û dezgehên hukumetê yê li Kurdistanê xera kirine, hilweşandine û talan kirine. Rejim di dilê vî miletî de jî kîn û rik û xezebê zêdetir qet ciyê rehîm û dilovanî û însanbûnê nehiştîye.

serê sibê di 17'ê mehê de em diçin Şeqlawa, li otêla Liqê 2'yan a PDK bi cî dibin.

Rojên me yê mayîn îdf pirtir li Şeqlawa derbas dibin.

Şer li Hewlêr û Silêmaniyê

Xeber tê ku li Hewlêr û Silêmaniyê şer di navbera leşkerên Iraqî û xelkê de derketîye. Gelek kuştî û birîndar hene, lê rastiya meselê çî ye, kes nîzane. Em guhê xwe didin ku her kes xeberê bi awakî neqil dike.

Celal Talabani di 19'ê mehê de civînekê bi berpirsiyarên YNK yê

birîndar in. Piştê 11 tank li ordiyê tîn vegerandin.

Li Hewlêrê jî meşek protestoyê pêk tê. Îhtîmal e rêxistina Royte Komünist (Xeta Komünist, Rotaya Komünist ku rêxistînek e nuh a piçûk e li bajarên, çepeke tûj û hişk e) li nav xelkê belavok belav kiriye û bangî meşê kiriye. Eskerên êrîş birine ser meşê. Şer derketîye, piştê top avêtine nav bajêr, du malên cîranên hev bi temamî hedimîne, hemû hatine kuştin. Pêşmergan jî êrîş birine ser leşkeran, xelkê hicûm birîye ser binaya wîlayetê. Bîna hatiye şewitandin. Ji meşê çar kes hatine kuştin, 500 kes birîndar û girtî hene. Esker û polîs mecbûr mane jî nav bajêr vekişin, derkevin dora bajêr.

Destê kê di meselê de ye

Ev agahdariyên Celal Talabani ne. Îro ez bi berpirsiyarekî PDK re sohbet dikim, ew ne raste rast be jî YNK sûcdar dike û dibêje pêçîka wan di bûyeran de heye. Li gor radyoyên biyanî Mesûd Barzanî, beyan daye gotiye destê hêzên biyanî di van bûyeran de heye, dixwazin ku guftûgo bi ser nekevin. Hukumeta Iraqê raste-rast navê Îranê dide. Li nav xelkê jî tê axaftin ku hin partiyên piçûk ên Îslamî ku ser bi Îranê ve ne, xelk tehrîk kirine ku meş û protesto çêbibin. Radyoya YNK jî îro di xeberên xwe de, reda wê yekê kiriye ku destê derva di bûyeran de heye.

Bi rastî destê biyanîyan di bûyerê de hebû tubebû ez nizanîm. Lê gava meriv li rewşa Kurdistanê Iraqê dinêre, jî bêkarî, bêerzaqî, bêmalî û perîşaniya xelkê, jî rewşa bêserûber û anarşiyê, jî ber kuştin û diziyê xelkê hatiye noxtek wiha ku, kî bêje rabin bimeşin, wê bimeşin. Ji bo meş û protesto û acizîyan, ewqas sebebên ciddî û di cih de hene ku, tu fêde nade meriv bêje destê biyanîyan tê de heye. Ger rewş neyê sererastkirin gelek caran bûyerên wiha dikarin rû bidin. Dost jî, dijmin jî wê karibin li pişt bûyerên wiha bin.

Herçî hal, piştî van bûyeran, îdara Silêmanî û Hewlêrê bi tevayî ket destê pêşmergan. Leşker jî bajarên hatine derxistin, vekîşiyane ordugehên xwe yê li dora bajarên, polîsan çekên xwe danîne, pêşmerge di qereqolên nav bajêr de bi cî bûne.

Waliyên kevin hin li ciyên xwe ne. Komîtek muştêrek di navbera wîlayetê û komîten cephê de hatiye danîn; bajar muştêrek tîn îdarekirin, lê ew-lewî, aramî û îstîqrara bajarên di bin berpirsiyariya pêşmergan de ye.

Çûyîna Hewlêrê

Piştî bûyera Silêmanî û Hewlêrê, di hevdiînekê bi Nêçîrvan Barzanî re, em pîrsa wê yekê dikin ka gelo îmkân heye ku em biçin Silêmanî û Hewlêrê. Nêçîrvan dide xwiyakirin ku ev bajar di destê pêşmergan de ne, lê der û dora wan di destê leşker de ye. Dibêje:



Carina zarokên piçûk wek çêlikên kevroskan serê xwe di hin qulan re derdixin û bi çavên mat li me dinêrin. Em fam dikin ku ew der mal e. Şofêrê me dibêje: ku îsal serhildan çênebûna, di meha gulanê de Rewanduz û Amediye jî wê bi vî awayî bihatana hilweşandin. Lê serhildanê ew xelas kirin. (Foto: Armanc)

kevroskan serê xwe di hin qulan re derdixin û bi çavên mat li me dinêrin. Em fam dikin ku ew der mal e. Şofêrê

Êvar e, ro li ber ava ye, divê em cardin vegerin Dole. Li vegerê, em diçin ser gola Dukan jî, piçêkî lê temaşe dikin. Goleka mezin û fireh e. Lê li dora wê ne avayî û ne dar û ber hene. Erdeka hişk û rût jî der û dora golê vedikişe. Bes du qeyik jî aliyekî diçin ber bi aliyê din. Di her yek jî wan de çend meriv dixuyên. Riyeke din di ber golê re diçe Ranyayê. Ranya ne dûr e. Lê li me dibe êvar, em naçin wir, paşde dizivirin Dolê. Gava em digihîjin wir, tarî ketiye erdê. Em şîva xwe dixwin, sohbetê xwe ya şevê dikin, derengî şevê diçin radizin.

siyayî û leşkerî yê der û dora Hewlêrê re dike. Du heval diçin beşdarî civîne dibin. Li wê civînê agahdariyên ku Talabani di derheqê şerê Silêmanî û Hewlêrê de dide ev in:

Li Silêmaniyê, di 18'ê mehê de mufrezek pêşmerge bi piqabê di ber qereqolek eskerî re derbas dibin. Ji qereqolê li wan tê reşandin, du pêşmerge şehîd dibin, yek jî birîndar dibe. Diçin jî qereqolê dipirsin, ew bersiv didin ku yê li pêşmergan reşandiye, serxweşek e.

Gava bûyer li nav Silêmaniyê tê bihîstin, xelk û pêşmerge jî bo protestokirina bûyerê meş dikin. Esker ve carê êrîş dibin ser meşê, 20 sivil tîn kuştin; pêşmerge jî li esker dire-şînin û şer fireh dibe.

11 pêşmerge şehîd dibin, 150 esker tîn kuştin, 18 tank tîn şewitandin, 11 tank dikevin destê pêşmergan. Piştê esker teslîm dibe. Zabit (Subay) jî di nav de 2500 esker esîr tîn girtin. Ji xelkê zêdeyî 200 kesan

Niha Qeladizî hatine li ser warên xwe danîne. Hin di holikan de ne, hinan hema molozen bin banê xaniyên xwe malîştine, qulikên wek goran çêkirine û ketine bin wan banên hilweşiyayî yê wek goran. Em di sûka Qeladiza re dajon. Li vî alî wî alî hin holik an xirbe hatine çêkirin û bûne dikan. Lewhe bi wan ve hatine dakirin, ji lewhan meriv tê digihê ku, hin dikanên kirînfirotinê ne, hin lokante ne, berber, terzî û yê din hene. Carina zarokên piçûk wek çêlikên kevroskan serê xwe di hin qulan re derdixin û bi çavên mat li me dinêrin. Em fam dikin ku ew der mal e.


nav bajêr. Li destê rastê girek e ku qereqolek nuh hilweşandî li ser e. Bajar wek erdhejek (bûmelerzeyek) xurt di merkeza wê de teqîya be, hedimiye, ne mal, ne dikan, ne mizgeft, ne dibistan û ne jî avayiyên resmî, tiştêk li ser piyan nemaye. Rismên Hîroşimayê yê piştî bomba atomî çawa xwiya dikin, Qeladiza jî li ber çavê me wiha ye.

Nufûsa Qeladiza li dor 45 hezaran bûye. Ji 12 hezaran zêdetir mal tê de hebûne. Di 1988'an de rojekê esker hatine, hemû Qeladizî, jî malên wan

me dibêje: ku îsal serhildan çênebûna, di meha gulanê de Rewanduz û Amediye jî wê bi vî awayî bihatana hilweşandin. Lê serhildanê ew xelas kirin.

Em qederekê li nav Qeladiza digerin. Li hin ciyan disekinîn, risman dikîşînin, derdikevin ser hin xirban û li der û dorê temaşe dikin. Lê kela dilê meriv radibe, bihna meriv diçike, meriv nikare tehamulî temaşe ve barbarî û hovîtiya han bike. Û meriv nikare ta-

Kurdistana Iraqê



Ev der gundê Korê ye. Di şerê piştî serîhildanê de esker heta vir hatin. Lê li vê noxtê pêşmerge bi şer û berxwedanek qehremanî ew rawestandin. Heft tankên wan bi carekê de hatin şewitandin. Nema karîna gavekê pêşde biçin.

(Foto: Armanç)

-Piştî buyarên dawî, hîn xeter ji hundur û der û dora Silêmaniyê ra nebûye. Ez bîm Silêmanî nuha bîmîne. Lê Hewlêrê hûn kîngê dixwazin bila pêşmerge we bibin û bînin.

Mamoste Mele Mehemed jî li nik me ye. her du bi hev dişewirin, ka kî baştir dikare çûn û hatina Hewlêrê bi ewleyî û rehetî bigre ser milê xwe. Mele Mehemed dibêje:

-Xalî Axa, amirhêzê mintîqa Hewlêrê ye û va ye li vir e. Hewlêrê ye, gelek meriv û nasên wî li Hewlêrê dimînin. Hema ji wî çêtir kes nîne.

Nêçîrvan Barzanî, Xalîd Axa dide anîn, meselê jê re bahs dike, ew jî bi kêfxweşî qebûl dike. Heta Nêçîrvan dikene, dibêje:

-Ji mêvanên me re firavîneke Hewlêrî ya malê jî çêkin. Dolme û kutilkên Hewlêriyan gelek meşhûr in.

Em ji bo 23 yê mehê li hev dikin.

Roja 23'yê Tirmehê, piştî taştê, Xalîd Axa otomobîlê û pikabekê tîne ber meqerê liqê 2'yan. Çend pêşme-

Li ser hev em pêrgî heft tankên şewitandî û perçekirî dibin. Xalîd Axa dibêje:

-Ev der gundê Korê ye. Di şerê piştî serîhildanê de esker heta vir hatin. Lê li vê noxtê pêşmerge bi şer û berxwedanek qehremanî ew rawestandin. Heft tankên wan bi carekê de hatin şewitandin. Nema karîna gavekê pêşde biçin. Piştî teqerawestan hat qebûl kirin. Korê hudûdê teqerawestandinê ye. Ji vir pê ve îdî kontrol di bin destê eskerên Iraqî de ye.

Gundê Korê li ser rê ye. Rê di nava gund re derbas dibe. Gund bi xwe avî ye û di newalê de ye. Leşkerên Iraqî di destpêka gund de li ser rê qereqol danîne û çûnûhatinê kontrol dikin. Em li ber xeta kontrolê radiwestin, zabitêk serê xwe xwar dike di camê re li me dinêre, peyvekê du peyvan bi Xalîd Axa re dike û paşê xwe dide alî û "oxir be". Tekî û cîba me, bi me û pêşmer-

ikeve. Lê rê bi xwe asfaltkirî ye, fire ye. Êdî li her derê, li serê her girî, li her newalê û fetlokê, li ber her gundî, li ser her pir û çemî em rastî eskerên Iraqî tîne. Yan qereqol in, yan kamp vegirtine, yan di kozikan de ne. Di binê çadîran de, li bin siya dar û beran û çarînan jî li ser rîyan esker dixuyên. Tank û topên wan, çekên wan li gor nîzama şer, her hinan berên xwe dane derekê, li hêviya teqandinê ne. Carînan qamyon û cîbên eskerî diçin û tîne. Erê di vê teqerawestanê de ordî li gora şer hatiye bicîhkirin, lê tu disiplin, nîzama û întizam û moralê eskeran de naxuyê. Hemû jihevketî, qirêjî û westiyayî dixuyên. Gava em di ber wan re derbas dibin bi çavên mat ên bêmane li pêşmergan dinêrin, pêşmerge jî bi kîna û moraleke bilind awirên tûj davêjin wan. Hin esker jî xwe di wê qermê de hingiya tengji û westiyayî ne, tu hay ji der û dora xwe jî neman. Yê ku xofê dixin dilê meriv ne ev leşkerên jihevketî yê pejmurde ne, lê ew tank û topên zêde ne ku berê hemuyan jî li bajarên û li noxtên stra-

Ji mesîfê Selaheddîn pê ve ber bi başûr de îdî çiya namînin. Deştêka bêserî û binî ya zîraî dest pê dike. Pêşmergeyek dibêje ku "ji vir pê ve heta çolên Erebîstan îdî her û her deşt e".

Piraniya gundên vê deştê jî berî serîhildanê hatine xerakirin û gundî di çend mucemian de hatine civandin. Pêşiyê Çemê Beşdarê. Pasê jî mucemîa Mela Omer dertê pêşiya me. "Serokê Mucemîê Şê Me (Şêx Mehemed) bû" dibêje Xalîd Axa, "lê di şerê navbera Îran û Iraqê de hat kuştin".

Piştî demekê li deşta rast Hew-

di hemû qereqolan de bi cih bûne. Polisên resmî jî bo alîkariya wan li wê derê ne.

Walî waliyê berê ye. Bi eslê xwe Kurd e, li gor peymanî otonomîya berê walîtiyê dike. Lê piştî serîhildana dawî komîteka muştêrek di navbera wîlayet û serokatiya cephê de hatiye avakirin. Walî ne bi serê xwe, lê tevî wê komîta muştêrek bajêr îdare dike.

Jiyanek normal li nav bajêr heye. Sûk bi insanan dagirtî ne, dikan vekirî ne, çûn û hatin û kirin-firotin normal berdewam e.

Em pêşiyê diçin li ber seraya wîlayetê peya dibin. Avayiyek sêqatî ya mezin û modern e. Li merkeza bajêr

Gava em di ber wan re derbas dibin ew bi çavên mat ên bêmane li pêşmergan dinêrin, pêşmerge jî bi kîna û moraleke bilind awirên tûj davêjin wan. Hin esker jî xwe di wê qermê de hingiya tengji û westiyayî ne, tu hay ji der û dora xwe jî neman. Yê ku xofê dixin dilê meriv ne ev leşkerên jihevketî yê pejmurde ne, lê ew tank û topên zêde ne ku berê hemuyan jî li bajarên û li noxtên stratejîk in. Dijîminayeti ne di çavên wan eskeran, lê di lûlên wan tank û topan de dixuyin.

lêr xwiya dike. Di nava bajêr de jî girêkî mezin û bilind dixuyê ku kela Hewlêrê li ser hatiye avakirin. Ji bilî kelê û avayiyên der û dora wê bajar hemû di rastê de ava bûye. Berî ku em tekevin bajêr qereqola noxta dawî ya qereqola leşkerî ya Iraqê li ser rê hatiye danîn. Ji wê pê ve îdî di nav bajêr de kontrol ne di destê leşker, lê di destê pêşmergan de ye. Bêyî ku qereqol me rawestîne em tê re derbasdibin û diekvin nava bajêr:

Hewlêr bajarekî mezin e. Nifûsa wê li dor milyonekê ye. Beşê kelê û der û dora wê ne tê de hemû avayî nûavakirî ne. Nêzî tevayîya wan di vê sedsala me de û piranî jî ji 60'î vir de hatiye avakirin. Piştî beyana 11'ê Adarê Hewlêr bû paytextê otonomîya Kurdistanê, dezgehên merkezi yê otonomiyê, avayiyê burokrasiyê, universite û dezgehên kulturî yê din lê hatine avakirin. Meclîsa otonomiyê li wê derê ye. Ji bo leşker û îstixbaratê jî gelek mal û xanî û avayî hatine avakirin. Piştî ku şerê Kurdan bi hukumetê re dom kiriye û şerê Îran û Iraqê derketiye û hukumetê gund û bajarên Kurdan ên li bakur xera kirine, gelek kesan rakirine mal û zarokên xwe bi koçbarî hatine li der û dora Hewlêrê bi cih bûne. Bi vî awayî bajar zû mezin bûye. Cadên Hewlêrê rast û fireh in. Xaniyê bilind tê de nînin. Piraniya avayîyan yek-du qatî ne. Yê pirqat avayiyên resmî ne, ew jî ji çar-pênc qatan berjortir hişkînişin. Malên xelkê sivil zêdetir yek qatî ne û hewşên bilind û asê li dora wan hatine avakirin. Navê cade, kuçe, semtan lewhên dikan û avayîyan hemû bi Kurdî hatine nivîsin. Lê lewhên avayiyên resmî bi Erebî ne.

li nêzî kelê hatiye avakirin. Cada merkezi di ber serayê re derbas dibe. Li ber serayê li rast û çepê deriyê sarayê du abîde hatine danîn ku di her yek ji wan de nivê pêşî yê sê hespên kihêl xwiya dikin ku rabûne pêdarê. Seray di serîhildanê û şerê-pênc roj berê de ji alî pêşmergan ve hatiye bombekirin. Wexta ku eskerên Saddam êrîş birine ser meşvanan pêşmergan jî ji kelê saray dane ber gullên top û RBG (Arbîciyan). Loma jî agir bi aliyekî serayê ketiye. Diwarên jî şewatê reşbûyî hê jî dixuyên.

Birazyekî Xalîd Axa niha li ser navê cephê li serayê kar dike. Ew bi xwe berê mamoste bûye û berê li dibistanekê mudurî kiriye. Navê wî Omer e. Xalîd Axa diçe sarayê, piştî demekê tevî Mamoste Omer derdikeve, tîne nik me. Mazûbanê me Mamoste Omer e. Bi dilgermî bixêrhatinê li me dike. Gelek kêfxweş dibe. Wê rojê heta ku em vedigerin Şeqlawa jî qedr û qîmetek gelek mezin dide me. Xizmetek gelek mezin ji me re dike û bi mêvanhezî û ihtiramek zêde me di'ezimîne.

Em li hev dikin ku pêşiyê em ê biçin kela û sûka Hewlêrê bigerin, bajêr bibînin û paşê werin malê firavîne bixwin û îstîrahet bikin. Mamoste Omer dibêje:

-De baş e hûn biçin bigerin, wextê firavîne ez li malê li hêviya we me.

Xalîd Axa berê erebên me dide kelê, tevî pêşmergan em hildikişin Kela Hewlêrê.

Kele kelayek gelek kevin a tarîxî ye ku li ser gir hatiye avakirin. Tarîxa avabûna wê nayê zanîn, lê şopên medeniyetên Sumerî, Babilî, Asûrî û Medîyan tê de dixuyên. Fire ye, 6 hezar mal tê de bicîh bûne. Diwar û burcên kelê ji tuxlayên pahtî yê zer hatine avakirin. Gelek caran xerabûye û hatiye restorekirin. Di nav kelê de avayiyên tarîxî û muze hene. Pêşiyê em ji ser burcên kelê temaşeyî bajarê Hewlêrê dikin, tevî pêşmergan risim dikêşin, rismê Hewlêrê dikêşin û paşê li nav avayiyên kelê digerin.

Hewlêr: giraveke azad li nav erdekî dagirkirî

rgê jî li gel wî ne. Em siwar dibin, pêşiyê diçin ber meqerê Cephê yê li Şeqlawa, Xalîd Axa huviyetên resmî û kaxîzên îzna çekhilgirtinê ji bo me tîne û em bi rê dikevin. Di pala çiyayê Sorîk re em berê xwe didin başûr ber bi Hewlêrê de. Divê em çiyayê Sefîn ber bi firehî bibuhurin û paşê dakevin deşta Hewlêrê.

Tankên şewitandî

Herêma çiyayî ye lê ne şaxên asê yê bilind in. Girîni mezin ên bê dar û ber in zêdetir. Rê li gor gir û newalan fetlokên tebîî dide xwe. Piştî 10 km'an ku em di ber girekî re fetlokekê didin xwe li rex rê tankeke eskerî ya şewitandî derdikeve pêşiya me. Piştî yeka din û yeka din û yeka din...

gen dagirtî, tevî çekên pêşmerge yê sivik û giran (ku ne veşartî ne di destê wan de ne) diherikin û diçin. Piştî gund em cardin fetlok bi fetlok berê xwe didin hevraz. Li serê hevraz ji nişka ve em dikevin nav qeza Selaheddîn. Bajarekî piçûk ê nûavakirî xwiya ye. Avayiyên wê hemû nû û modern in, cadên wê fire ne. Li ser rîyan, li dor malan û avayiyên din darên çaman bilind hilkişiyane.

Herder bi esker e

Em li Selaheddîn nasekinin. Ji Selaheddîn pê ve rê îdî fetlok bi fetlok ber bi deşta Hewlêrê dadikeve. Fetlokên rê ewqas di ber hev de ne û nişûvî ewqas nêzî şaqûliyê ye ku meriv dibêje qey meriv di pêpêlûkan re dad-

tejîk in. Dijîminayeti ne di çavên wan eskeran, lê di lûlên wan tank û topan de dixuyên.

Serê çiyayê pêşmergan dagirtine

Gava em xwe digihînin deştê û çiyayê Sefîn û Mesîfê Selaheddîn li pey xwe dihêlin, tu dibêji qey pêşmergeyek, di çavê min re ramanên min dixwîne, li pişt xwe dizivire û pêçika xwe ber bi lûtikên çiyê ve ji seriyekî heta serê din dibe û tîne û dibêje:

-Ew lûtikên han seranser tîjî pêşmerge ne. Bi hezaran pêşmerge li wir di xeta pêşîn a cephê de ji bo şer amade ne. Roja ku şer derkeve ev ordî wê teslîm bibe û ev çek hemû wê tekevin destê me.

Hejmara bê:
Veger

Bi Erebî dinivîsîn, lê bi Kurdî dişewitin !

TAHA XELÎL

Helbestvanê bêrikirin û şînan...

M. Eflî Huseynî

Ehmed Huseynî

Taha Xelîl helbestvanê bê payan yê bêrikirin û şînan e. Ew, ji bejin û bala çiyân, ji çavên westiyayî yê deşt û zozanan, ji pel û çiqilên evînê yê ku bi bager û wêranên dagirkeran zer dibin, ji gavên bê dûzan yê hevaline ku dimrin an wenda dibin, helbesta xwe pêşkêşî me dike...

Ji helbesta wî; bêyî propogandên mezin, bi zimanekî zelal bîna gundên Kurdan, dayikên reşgirêdayî, tiliyên bi xwînê şilbûyî melûliyê, têt.

Helbest tê afirandin û herikandina xwe berdewam dike li nik sînorine ku aheng û stiranane perçe-perçe dikin, ku mayinên dijmin giyanên kesk û nû bişkiwî tar û mar dikin.


Di helbesta wî de herdem gava pêşîn bi mebesta himbêzkirina welatekî gulperest dest pê dike. Mirovê evîndar nêzikî mistdana sînga dilovan dibê... lê ji nişkê ve çavkaniyên xwînê ji memikê welat dipijiqin û Taha Xelîl tika dike ku serê welat bi xwîna xwe bişo:

Ev welatê min e...
Wekî min got: Ev welatê min e...
Koledarê min!
Sedîsed... Ev welatê min e...
Ji mafê min e, ez wî tîkim
teşteke biçûk
û serê wî
bi xwîna xwe bişom!!

"Çiqasî min dixwest ku ez sirûdekê ji bilî vê birêjim". Bi vê hevokê, ya ku helbestvanê Kurd ê mezin Selîm Berekat berî çend salan di pirtûka xwe ya bi navê "Quling" de gotiye. Taha Xelîl jî pirtûka xwe ya bi navê "Berya Derbasbûna Şînan" dest pê dike. Cîgeh û waran amade dike, hemî kuçe û kolanên demê yê ku di can û cesedê şûn û şopan de derbasbûne, tîne zimên; "Çiyayên Kurdistanê -Zêwe-Qamişlo-Pira Cexcex" li vir, li ser van diwarên bêdeng, li bin siya nûçeyên mal-kambax, hiş û sewdan xwe davêjin bextê girî. Tabloyên xwînê hê zuha nebûn e û Diyarbekir hê di xwîna şehîdên girtîxanan de digevize:

Tu hildiperikî -nizanim ji kuderê-
Tu di himbêza min de yî
bi hev re em dest bi xwendinê dikin:
-Li ser wêrangeha "Zêwe"
-Li ser evîndarên başûr
-Li ser berevajîya jiyane
li Diyarbekir...
-Li ser mûzîka partîzanan...

Li gel vê jî... Taha Xelîl na-



van bi awakî serast û ron li ber xwendevanan radixîne. Navên ku şînan av didin û bi kurte-pista xwe dil hîni qîrîne dikin: "Hewar-Kawa-Cûdî-Leyla-pêşmerge-Mano" Wisa dighêje navê xwe ta ku hemî cureyên axîne bi zimanekî xweşmêz, herifî û carina tarî û madtirş bighîne mirov û armanç ew e ku: helbest serbixwe be, tenê helbest be. Çarhawîr bi rengekî reş hatiye nixumandin, bahoz û aramî şikeftê diçirîne, di şikeftê de pêşmergeyek û xewna pîrozî bi hev şa dibin... Lêbelê tîne:

Gava ku derbasî şikeftê bû...
Kevok firiya...
Pirê konikê xwe neristibû...
Û bêol hatin...
Faşist hatin...
Ew birin...
Ew bir... in...
Wî bi... ri... n
Li şûna wî gullek mabû
Li devekî... an li lûla
tivingekê digeriya!!

Taha Xelîl carna pîrozwer û paqij, carna bi nifir û le'netên qirêjî têt. Bi şîne û bêrikirinê xaçerêkên helbestê ji mij û moranê, zelal dibin. Pencereyên xwe mîna du baskên şikestî vedike ta ku çav li kulîl-kên çilmisî temaşe kin û ta ku tecrûbeyên jiyane ên bi tîkçûnan, bi serbilindahiya nenas a Kurdan dagirtî xweştir xwe li ba kin.

"Ji dîr, ez dengê te yê... didim hev"

Dike hewar... Dixwaze bêje ku dengê te yê Kurdî, yê kevnar, ji bin simên dîroka rûreş didim hev... lê eger wisa be, pirtûk nakeve çapxanê... Mercên çapê!!? Mercên ku Kurdistanê di nav du nenûkên vala de, bertîr dike:

Mehrecan, dişahiye evare
babelîsk

şoreş
nimêj
ne ji boyî min in
Û (.....)
ew ji ne ji boyî min e!!?

Taha Xelîl di helbestên xwe de mîna jiyana xwe ya rojane ye, melûl, hunermendekî xemgîn û bêcare ye. Ji bo afirandina pêjnên bêrikirinê hozanekî dilsoj e. Radeşt û bêhêz e li hemberî pêlên dîrbûna berbangî çiyân ya zêrîn û mûqades.

Hergav hevalên ji ceng û şewatan bazdayî li nik rûdinin û serpêhatîyan bi şevê re dibilînin. Taha Xelîl di guhên çarmedora qetranî de dike piste-pist. Tirseke bê hempa wî jî bîrkirinê, ji mirinê û ji xwîna wîndî bûyî, aza dike.

Vedigere û ji nû ve li hember sirûda welêt radiweste û dipirse:
Ev tu yî çiyakî ji kevokan
Ji bin û westanê, ji daran...??
Ew tiliyên min in
diçêrin mîna keriyekî
Mîna çavên min
Ku giyahên xwe di te de diçêrin...!?

Lê serbazan bi potînen qalind dane nav simbilên nûxunavgirtî, di şûna çêregeh û destên keskîni de, xwelî û hêşir hevûdû himbêz dikin, tilî û stûnên konan bi hev re çermê zemîne dixemilînin:

Ha wa ye evîna min.
Bajarekî mişt e
ji penaberan
ji evîndaran
Ha wan e cejnên min...
Û ew ji wan e...
stiranên min belav dikin...
min ji belav dikin...

Wekû miheke di nav lepên guran de guran...!!

Eger Taha Xelîl hat hişê mirov, di cî de gundê "Xezna" jî têt bîra mirov. Ji vî gundî, cara pêşîn berê xwe daye Qamişloka rengîn. Û paşê li Şamê xwendina xwe

berdewam dike. Li Şamê xwe dîrî her tiştî dibîne. Tiliyên ku giyahên Xezna û hinarkên Qamişloke didiqdîqandin, nuha... Ji dil û giyan dîr ketine. Lewra û zû bi zû dibê evîndar, hewl dide ku bi şitla zaroktiyê ya nazenîn û çeleng re peywendiyên eşqê damizirîne... Nuha û li şarên biyaniyê, zûhabûn dilive û xwelî ji pênuşê diweşe. Çend sal in, lê bi kewan, bi bêrikirinê, bi hêviyên şikestî tîne xemilandin. Bang dike. Gazî dike, lê deng tîkçûyî ye, dest girêdayî ne û xatirwestineke meşînî xwe berdide hêlîna xewnan:

Eger tu çemên min
li min vegerîni...
Eger tu perrên dil
basko bikî...
Û em xwe bi hev re berdî
mîna du kewên
ji bêrikirinê...
ji giyanê...

Carna mirov pê dihesse ku Taha Xelîl dixwaze bi qîrîna Kurdistanê stiranên xwe biafirîne. Êriş dike. Pêjn û laşê

xwe şiyar dike. Gulan, yarê, hevalan, xaniyan û navên kesên ku beşdarî wicdanê wî ne, tevî wê şiyarbûnê dike. Şînan û bêrikirin, bêyî ku bikaribin çarçeweke romansî bidin welêt, bi zimanekî şermezar û veşartî kêfxweşiya Kurdan ya hisî tîne ber ronahiyê. Ronahî jî pêlên bîna Taha Xelîl e, bîna ku ji roka ber êvara gundan hatiye pê:

Mistek ji axîna dil...
Zeviyên te di min de şînan tîne
û xelkên te jî...
Rokek berz têt bîra min
ne xuyayî...!

Taha Xelîl bi destê helbesta xwe girtiye û bi aram tîne cokên xwîna Kurd yê ku nayên jibîrkirin. Li esmanekî, li ramanekê û li bûyerekê dipirse, ta ku bikaribe li navê şar, zarok, ceng û wêranan rast bê. Bê westan li çarmedorî gulîstanek sor digere û pîrsa wî ya herî mezin ev e: Ma xwîn av e? Ma xwîn di rehê çiyân de çik nabe? Lê xwîna pîroz mîna dîlok û sirûdan, mîna çavên nobedar û sînoran, mîna pevçûna mirovê Kurd bi Xwedayê ziyane re (di ola Zerdest de) berdewam dike. Xwîn di hişê Taha Xelîl de her gav sor e. Hesrekeke bi şewat e, ji ber vê yekê, dest bi kûre-kûre dike, xwe û helbesta xwe di mijara vê xwînê de bi nav dike. Hozanekî bi tenha ye. Tîkçûna wî ne ya gelê Kurd e, ne dawîya govendê ye.

Sirûd dimre û Taha Xelîl ranaweste. Bi tîrsê re, bi tenhatiyê re, bi ewr û dengên rût re, kenarên helbestê derbas dike. Mêrkujên dîrokî, sextekarên bêjimar, kêrên

tûj yê bayê felekê. Têv bi hev re li ser qublenama giyan û gerzela berbangê, li ser bijangên zemîna dîlpak û şox, planên xwe yê girî û kuştinê li dar dixînin. Di vê qonaxê de Taha Xelîl girî ji bîr nake, lê helbest wisa nayê..., êşên biçûk, cureyên dagirtî, şîniyên bi bejn û bal yê ku li balefirgehan in, li paytextan in, li ser milên şoreşger û welatperweran in, bi xwe re tîne û her tiştî di kata xwe de, bi gewde dibê.

Di van kêlikan de, hunermendiya helbestvan di danheva vê ketinê de ye. Di demên tof de, gava mirov welatê xwe bi kar tîne. Û "berya derbasbûna şîniyan" berî ku dagirker, mêrkuj, tolaz û gewad bi pêş de werin. Ta ku hinarkên sor-gul û çiçekan, porê binefş û zersosinan bi derd, axîn û xerdelê bîbarînin:

Rahişt şîna xwe...
Bêrikirina xwe
Nale-nala zaroka xwe
maçên jîna xwe
Û berya ku rahêje welatê xwe...
Hatî...
Pir bi lez hatî...
Wî Zeynebê distira
her ku min didî!!

Bi qurtên mezin axînan vedixwe. Dibêje "ax" û axîna wî ji sînor û pîrsan diherike, li bin guhê Cudî û Toros dikeve û tevî axînen Qendîlê dibê.

Û herdem sersaxî bo helbestvan ne pêwîst e, herdem di navika mirina Kurd de dijî, hêsrên û serjêkingehan, berevajîya jiyane li Diyarbekirê dijî û dibêje:

Zarokên bê bav, bê lîstik, bê şêranî, bê cejn û rojbûn. Xwedan çawa diwêre li jor wan di xewke... Wisa Taha Xelîl dipirse?

Ew zarokên "bê zarokî"
Çawan xwedan diwêre li jorî
Wan di xew ke?!
Ew kesên ku sînor derbas kirin
bi alî mewîjan ve,
ma êşên xwe hilgirtibûn.
Di şûna hemwelatîyê de?!
Dayika ku ji şîniyên xwe re
lîrand...
Ya ku şînen xwe belav kirin
li girtîxanan
Li paytextan
Kê gotiye:
Buhîşt di bin lingên wê de ye?!

Bi qasî ku xewn dîr e... Taha Xelîl têt, bi hedan, bi alavên afirandinê, perçeyên xwe û yê me dide hev. Me li nik sînorên pey û wênayan radiwestîne. Û bi durustî êşa me û xemgîniya sibehên evînê bi dar ve dike.

GAMA VERÊNI

ronişt. Neyse, xwi ra hewiya mi zî nêameynî, Hûmay kerd ki gurey jey zaf nêramit.

Mêrdek ki werişt, 'Elî Riza Çelik mi ra persa, va:

-To xeyr o, ti semedê erzihalî ra amey?

Mi va: -Ney, ez semedê erzihalî ra nêameya, ez ameya ki jey veyna.

Ew mi va hal-mesela ino hewa, mi dey rî sebebê ameyîşê xwi va. Mi ki vatişê xwi qedêna, o gamê duşunmiş bi, va:

-Wariza, e, raşt a, ino cis yew çî esto, ayo ki ti bedê geyrenî zî ez a. La çîyo ki ez vaxa çîno. Qusirdê mi meewnî, ti indi ca zî amey, seki mi va, çîyo ki ez vaxa çîno.

Dim a gamê vindert, va:

-Ti yew çaya ma nêsimenî?

Ina ki va, mi nêşîya çî vaxa, qalê mi heme qediyay. Qalanê jey ra, miruzê jey ra bellî bi ki raşt nêwaştî qalî biko. Ri sernayîş, yanî israrkerdişî fayde nêkerdnî. A gami gazete mi vîr kewt, dim a Şeto ki ez erşawita, imbazê mi, waşt a mi, piy mino ki hinî mi nêwaştî jey veyna. Indî ca ameyîş û bê karekî kerdîş ageyrayîş weş nêbi. Sewki ez veng û varit biageyraynî, ez senî hewa ridê jîni ra ewniyaynî? Heto bin ra heneka 'Elî Riza Çelik'î çînebî. Elhasil, biviraziyanî biviraziyanî, meselada mi ra yew filmo dramatik viraziyanî.

"E", mi va, "yew çay şimitiş baş beno."

Hetana ki çay amey, ma naşt-daşt ra çînd qalî kerdî. Mi ra persa, va: "Ti kam gazete di xebitîni?", "Ti kura ra yi?" filan-bêvan. Hêşê mi di tim vengageyrayîş bi. Ay semed ra mi qalî kerdnî la mi zî nêzanaynî ez se vana.

Peynî di mi qerarê xwi da ki ez şêra. Hetî ra mi hêz da xwi ki ez wada, hetî ra zî mi va:

-Ti zanî. Eki ti vajî, ez şîna ver bi şan yan zî meştî gilana bêra. Raşt a jey ez semedê inî gurî ra indi ca ameya. Xwi ra ez kardê xwi di zî hema newe ya.

Va:

-Temam wariza, mi fahm kerd, la seki mi va, gilana ameyîşî ser o qet-hane xwi medejni.

Hinî çîyo ki mi bikerdnî çînebî. Cakerdiş mi mêrdekê xwi ca kerdbi, la çî fayde ki nêwaştî qalî biko. Mi xwi hetî vatbi "Mela pîzey jey mi ve-şo", a zî veng vejîyaybî. Peynî di mi ti ra xatir waşt, mi va hetana meştî ez filan otêli di ya ew ez teber kewta.

Ez raştî vaxa, ez qet mêrdekî ra hêrs nêbiya. Qalanê jey di çîyo ki mêrdim pey bidejo çînebî.

Ez şîya, mi taştî werdi ew mi da pi ro ez şîya otêlda xwi ki ez tikê rakewa.

|| Ez ki otêli ra vejîyaya teber hinî êrewo teng bi. Şenikeyda xwi di zî ez ino şaristan di mendbiya, mi inê cay weş şinasnaynî. Ez naşt-daşt a gami geyraya û ewniyaya ki inka ta'mê geyrayîşî çîno, ez tepa ageyraya, ameya otêli.

Katibê otêli va:

-Yew mêrdek ame to persa, va "Wa meştî linga xwi mi ra fino."

Mi pîzedê xwi di va "Mi texmîn kerdbi ki inê mêrdekî di tanî çiyê xamî estî, cûka qalê jey indi nerm bi".

IV Rojo bin şefeqî tarî ra ez xwi aqilîyaya. Hewnê mi remabi. Semedo ki hema zaf rew bi, mi waşt ki ez tikêna busa. Mi xwi ina kiştî da, kişt a bini da, nê herê, veng a. Mi xwi tim yazixanedê 'Elî Riza Beg'î di dîni. Ma dest bi qalan kerdnî, mi ra tanî çiyê gelekî xamî

vatîni. Çi ki jey vatîni mi teybda xwi di qeyd kerdnî. Ge-ge zî ez ti ra çî persaynî. Her gama ki ez persaynî, jey mesela hina dergi kerdnî. Mi roporta-ja xwi qedênaynî, ba'dî mi xwi hadire kerdnî ki ez otobusa verêni reydi xwi Estenbul resna. Ez Estenbul biresaynî ez ka a gami şêra cay gazetî ew Şefî veyna. Goşê mi reqaynî, seki Şef gûştariştî ra pey mi ra vajo "Eferim xorto! To bi risipênay yew gurewo baş kerd, to rîyê mi zî sipî kerd, ey xwi zî."

Ba'dî, inê fikrî vila bi, geyrayîşê mino vizêrên kewt mi vîrî. Vizêr ez ana veng geyrabiya, inka zî çiyê ki serran ra ver mi dîy, kewtîni mi vîrî. Ez cili ra warîşt a, şîya mi paca akardi, heway hûnikê serê sibay debi zere. Teber hinî weş roşn bibi, şar kuçan di şîni-ameynî. Tatîrotoxan ganî lezi bikerdnî, çimki zanaynî ki gedey Baxleran, ey Melîgehmedî, ey Xançepêki, ey Mehla Zixreyijan (Mehla Bazarî) ew ey mehlandê binan fekê pacan û beran di tatî paweni. Inka, ino hing di cigercî çiraxandê xwi ra hêrs binî, "Lez biki" vatîni, "yew kermata qeseba menda hema, ganî ti topê ja bidî şîşan ro, bewnî adir zî hewna şî." Tanî dikan-darî herey kewtîbi ki dikananê xwi akî, cûka hema vengê tek û tuk dereban ameynî.

Gama ki ez paca ra teber a ewniyaya, ez xwi bi xwi 'ecêb menda. Ez gedeyeya xwi di inê cayan di mendbiya. Key ma Baxleran di nêbi, Mehla Zixreyijan di zî nêbi labelê mi gilana zî zanaynî ki inê mehlayan di se beno se nêbeno. Ez hema gede biya ma ewta ra key xwi bar kerd, wena. Piy mi ki ge-ge qalê inê cayan kerdnî, zera jey zîz binî. Mi pîzedê xwi di henekê xwi bedê kerdnî. Beno ki mi rasterast henekê xwi bedê nêkerdnî, la seki nêva Hûmay raştî ra hes keno, inê cay mi rî indi bar zî nêbi. Belkî piy mi gilana ay qalan biko, ez gilana ay hewa duşunmiş bena. Mêrdim nêzano gedeyeya mêrdimî kura û key kewena mêrdimî vîrî. Ti vanî qay to xwi vîrî kerda, wext û cay estî ki nişka ve ra gedeyeya to vejêna raste, xwi nawnena. Zer ba kê bena a zana, nêbena a zana, kê nişnî ti ra biremi.

Çi ray mi vîrî nêşono, ma serrandê hewtay di bi. Beno ki hewtay û hîrê, beno ki hewtay û çar bi. Datê mi amebi key ma. Telebe bi datê mi, Anqera di yew mektebê pîlî di wendîni ay wext. Çimê mi di indi pîl bi ki mi nêzanaynî çî yo, çî mekteb di waneno. Yew gazete te de bi. Mi zî wendişê Tirkî zanaynî. Aşman ra yew aşma wesarî bi la nîno mi vîrî kam aşmî bi; aya ki mi vîrî yena a ya ki vamêran vili kerdibi, hema vajî "aşma vila vamêran". Yew yaziyê ay gazetî hema zî mi vîrî ra nêşîyo. Gazete di herfanê girdan reydi bi Tirkî nuştêbi "Daraağaçında Uç Fidan". Ez persabiya, datê mi zî mi rî vatbi ki hukmatî semedê çî ra ay xorî kiştîbî. Inê hiri xortan ra yewî, hema wexto ki zaf werdi bi, pey perandê xwi feqîran rê nan erînabi. Hêşê mi nêkewtîni, mi fam nêkerdnî ki senî hewa mêrdiman şînaynî inasar yew xortî bikişî. Ez vana qey hêşê datê mi zî nêkewtîni.

Mi xwi bi xwi va "Inka ino serê sibay indi çiy kura ra kewtî mi vîrî?" Tam ay hing di telefoni ki ciniyay, ez xwi hesiyaya. Mi vizêr şan di katibê otêli temên kerdbi ki mi werizno. Ay semed ra telefoni kerdibi. Semedê telefonkerdişê jey ra mi dey rî teşekkur kerd û mi va ki ez werişt a ew ez ha şona teber a arîya xwi kena. Mi ki telefoni paday gilana 'Elî Riza Beg' kewt mi vîrî. Mi xwi hetî va "Ez ki arîya xwi bika, gamê bigeyra û dim a zî şêra jey hetî".

Ez gamê sukî miyan di geyraya ew

ver bi teşarî ez şîya yazixanedê jey. Tena bi û pabey mi bi. Ewro rîyê jey yewna hewa bi, kê vatîni qay hêşê jey beyntardê ewro û wextê verêni di şono-yeno. Mi ra persa ki otêla mi baş bi yan ney. Hetî ra zî ma rî qedehandê xişnan di çay waştî. Ewta gama ki mêrdimî qedehi tebiştîni, qedehi destê mêrdimî pîr kerdnî ew çaya ja yew qulti di nêqediyaynî.

"Meselaya ki" va, "ti semedê ja ra amey, mi rewna ser o qalî nêkerdo. Indî zaf çî çîno ez vaxa, raşt a jey mi nêwaştî qalî bika. Hetî ra zî ez te de gelekî dejabiya. Mi zaf qahr û kezlately anta. Ez zana ki şîma, yanî gazetey sey gazetanê şîma verî menfe'etê xwi duşunmiş benî ew heme vatanê kê nê-nisenî. Feqet semedo ki ti 'eware bi, indi ca amey, ez qayîl niya to veng biersawa. Reqa mina ki esta ina ya: Hetana ki ti şîni, vatanê mi mebedilni, meherimni. Ez zana, çiyê ki ez vaxa zaf xamî niyî feqet rayna zî ti yan jîni mebedilni yan zî neşr meki."

Çindi vajî indi keyfê mi amebi. Qalê jey weş bê mi şîbi. Mi va:

-Hetana ki ez bişîna ez sey to kena. Xwi ra piy mi zî Kurd o.

Vatişê ina qala peyeni îcab nêkerdnî. O mi ra Kurd biyayîş yan zî nêbiyayîşê pêrdê mi nêpersabi labelê hinî mi vatbi şîbi.

A qali ra pey 'Elî Riza Begê to tikê xwi ver o ewniya, dexeriya, kê zanaynî ki hêrs biyo. Kê şînaynî çimandê jey di hêrs û nefretî bivîni. Hêrs û nefreto ki ey zorkanî daybî vinder-rayîş.

Tikê vindert, va:

-Wariza, xwi ra megîrî feqet ina qalda to ser ra yew mesela binî mi vîr kewtî. Yew imbazê mino Cizîrî bi, yew deme reisê belediya bi. Biray jey zî, Anqera di yew ca di ma'mur bi. Çi ki bi, neyse, yew roj inê wîrdî biray Anqera di, yew mehla ki pêti te de roşeni di, yew ban geyrenî. Rayîr a yewbinan reydi Kurdkî qalî kenî. A gami yew mêrdeko ki cilê weşî pi ra dayey ver bi jîni yeno. Tîpê mêrdekî ra bellî yo ki yewdo pêto o. Pey yew Tirkîya naziki vano:

-Qusurdê mi meewnî, şîma Kurd î?

Imbazê mi vano:

-E, ma Kurd î. Qey xeyr o?

Mêrdek vano:

-Mi texmîn kerd ki şîma Kurdkî qalî kenî, piy mi zî Kurd bi...

O ki ino hewa vano, imbazê mi hêrs beno, vano:

-Begefendî, qusur meewnî, qey la ti? Ti pînc î?

Mêrdek ina qali ser ra hêrs beno, vano:

-Pînc ti yi! Ti senî hewa qalî kenî? Ti ki veynî ez se kena to, ez to lorî dana!

Imbazê mi vano biewnî begefendî, namey mi ino yo, ez filan ca di bena, filan karî kena, biray mi zî filan ca di wo. Şo, ti se kenî biki. Çi ki to ra yena, tepa medi. Ew jey ca di verdenî şonî.

Çindi aşman ra pey yew mektub yeno Cizîri, imbazê mi rî. Mektubi ra fam beno ki qala ki imbazê mi verî kerda, zaf mêrdekî ginaya. Ti ra pey hêrsê jey ki niştî, şîyo key piy xwi, tanî zeman weyra mendo. Ay beyntar di çindi qalanê Kurdkî zî bander biyo. Inê qalanê 'Elî Riza Beg'î dim a mi vengê xwi nêkerd. Mi tena gûşdarit. Ez şermezar bibiya. Wa ayo hing di 'erd biabîni ez ti ro bişîni war.

'Elî Riza Beg'î dewam kerd, va:

-Ewta munasib niyo. Belkî cay yew bêro. Eki to rî zî dest dano, ma şêrî keye. Ma ki him nan borî him zî bite-riqnî.

Ma weriştî şî keye. Ceniya jey werd hadire kerdbi, ma dest bi werdişê werdi kerd. Mi teyba xwi akardi labelê ez ti ra çiyekî nêpersaya. Mi rî

Hindik-Rindik

ROJA MIRINA SEDAM

Seddam, piştî ku ji herba bi muttefikan re bi saxî û selametî xelas bû, çû ba jineke falvan, got:

-Tu dikarî ji min re bibêjî ezê kinga bimrim?

-Helbet ez dikarim bibêjim, tu yê roja Newroza Kurdan bimrî.

Seddam veciniqî, got:

-Tu çawa dikarî sedî sed bizanibî ku wê mirina min ew roj be?

Jinika falvan got:

-Pîr hêsa ye, hema tu kîjan rojê jî bimrî, wê Kurd wê rojê jî xwe re wek Newrozê pîroz bikin.

APÊ HES

Xortê gundi nuh zewici bû, hîn zavayê şeva duduyan bû apê Hes çû bû mivanê wî. Heta dereng rûniştin, şev zîz bû, apê Hes ranebû. Mesele li ser mesele digot. Xort bala xwe dayê ku apê Hes çî li xwe germ dike û çuyin tew qet nayê birê. Xort got:

-Apê Hes, heger tu dewletî bûya, yanî perekî te yê pîr hebûya, te yê çawa bikira?

-Hema min yek nedikir dudu, ezê biçiyama hecê.

Xort got:

-Mala te jî vir 100 mîtro ye, jî êvar de ye tu di xwe re nabîni herî malê. İcar tu yê çawa herî hecê?

Û bi xatirê we!

"Birayê hêja

Ji mêj ve ye ku min û Zîne nêt hebû ku nameyekê ji quncikê te re bişînim. Çimki vê dawiyê, me xeteriya Mahmûd Lewendî li ser te dît, me got em herin gaziya Zinarê Xamo. Gava em Armançê digrin, pêşî em quncikê te dixwînin; em dibêjin a îcar te kuç di serê kê werkerî ye? Yanî quncikê te ji benîştê Mehmet Uzun çêtir bû. Lê em dibînin ku birayê Mahmûd Lewendî bi 'Mirkutê' xwe ve hatiye xwe daye kêleka te. Tîrsa me ew e ku çiyê te bigre, çimki 'Mirkutê' wî heye û ew bi xwe jî pîr î yeman e. Me got em ji te re bibêjin, bila haya te ji 'Mirkutê' wî hebe ha!"

Ji bo vê xêrxwazî û dilxwaziya birayê Amed bi rastî jî ez kêbweş bûm. Lê çî heftî ku tiştê birayê Amed jê dîrsiya bi rast geña, yanî dawiya dawî min jî ber xwediye 'Mirkut' bazda û çiyê xwe da "Beroşa" wî. Lê ez gelek sipasî hevalê Amed û xwişka Zîne dikim di vê roja min a teng de wêrbûna li hember "Mirkutê" Lewendî dengê xwe bilind kin, û werin gazi û hewara min.

Amedekar: Zinarê Xamo

mesela xwi sere ra vati. Zaf dergi zî nêkerdi. Ge-ge hêrs bi, ge-ge zera jey zîz bi labelê pîze bi xwi nêveşna. Caran poşman nêbibi, vatni:

-Ez çîna ver nêkewena, ez herey xwi hesiyaya, ez aya ver kewena. 'Eslê ma hetê Wanî ra wo. Piy mi ma'lim bi. Semedê ay heway ra ez epey cayanê Tirkîya ra geyraya. Piy mi qayîl bi ki ez biwana, tim ez teşwîq kerdnî... Sawcî biyayîşê xwi ra pey ez yew-di cayanê binan di xebitîyaya. Ba'dî ez daya Diyarbekir. Keyfê mi zî ame, mi Diyarbekir ra zaf zaf hes kerd. Wesarê serra hînzar û new sey û hewtay û di'y bi. Ay serran di eskerî tim vîstî dewan ser. Şar sa'naynî, areme kerdnî. Ti zanî, dewan di dişmeney zaf a, dewijan zî tim gerrey yewbinan kerdnî. Nêzana vatnî şeqdarbê filankesî, mawzerê bêvankesî esto. Raray inê gerrey raşt vejîyaynî feqet zaf ray nege bi. Qereqol zî ino cis çîyan geyraynî. Çimki cendirmey tim hazir bi ki şorî dewijan finî iskincî ver.

Rocê ez 'Edlîya di ronîştêbiya, ka-tîbî ber kut, ame zere, va:

-Yew dewij amewo ki gerre biko.

Helbet semedê gerrekerdişî ra ameyîşê yew dewijî çido xam nêbi. Mi va:

-Wa bêro zere, veynî se vano.

Dewijê to ters û şermî reydi ame zere. Çewres û panc-pancas serre bi. Cilê jey indi keyenî nêbi. Semedo ki amebi şaristan sey dewijanê binan cilê

xwi yê şaristanî xwi ra daybî. Gama ki biameynî şaristan inê cilî xwi ra daynî. Dîlekça jey jey dest di, destê jey zî vemîda jey di ver bi mi dergkerde, heta masêdê mi ra ame. Dîlekça xwi masî ser nay ew peykanî di-hîrê gamî şî.

Mi dîlekça jey girewtî wendi. Dîlekça gore, wexto ki cendirman vîstbi dewa jîni ser, başçawîşê qere-qolî yew mêrdek û ceniya jey kiştîbî, dim a zî emir dabi, vatbi "Meytanê xwi lezi wedarî, dekî tîrî! Eki şîma gerre biki, ez şîma hemîna erşawena jîni hetî". Mi va:

-Ino senê gure wo? Beno ki yew şaşey biya, nê zî beno ki waştî te-roristan reydi biremi, cûka başçawîşî pa nawo kiştî. Nêki qey senî yew başçawîşê dewletî bêsebeb yewerî kişeno?

Ez mêrdekî ra tikê hêrs zî biya, çimki dîlekça di niştbi ki "Mêrdimê ki kişiyayî, bêsuc û bêgune bi".

Ez duşunmiş biya, inî erzihalî ser o ganî ma biweriştîni bişîni a dewî. Dewî zî duri bi û rayirê ja baş nêbi. Vengda doktorî dayîş, şeyîş, otopsi kerdîş, hînzar û yew gure. Ma "fazla mesaî" ra çendi qurîşî girewtîni la wa la'net biameynî qezenkerdişê peranê ina-sarênan. Peynî di mi va "Çi ki îcab biko ma ki biki" û mi mêrdek ray kerd.

Dewamê ci esto

GAMA VERÊNÎ

Roşan ROŞN

I
Ez cay karê gazetî ra hêrsî reydi vejîyaya. Hewran xwi antbi pê ser, xwi pingimabi. Serd bi. Mi zirarê qaput-dê xwi ta finay, destê xwi dekerdî tanekandê xwi û xwi rêze ro vera da war. Vatiş asan o, inê serê şanî di semedê şeyîşê keyî rî, verî wapuri wenîştîş, ti ra pey trenî, ti ra pey zî mînbûsî wenîştîş wext gêno.

Waştâ mi mi vîr kewtî, ganî ez ja rî telefon bika. Siba ma şonî taximêdê oda rakewtîşî erinenî. Semedê erîna-yîşê inê taximî rî piyê ja perey day ma, cûka mi hinî nişya çî zî vaja. Şima mi persî, ino cis yew çî rî indi perey nê-dênî, de bê hêşêdê ja finî. Nêzana kam imbaza ja zewiciyaya, yew taximo zaf weş erînawo, vana "Ganî ey ma ey ja ra rindêr bo". Yew cina mi vana "Xwi inê belay ra pak ki", labelê eki mêrdim raştî vajo, pêrdê ja ra zî nêbînî çî kesî gazete di karo inasarên nêdaynî mi. Piy ja yew ray telefoni kerdî, kar bi hedre. Herçiqas ki ewta yew mi gaze-tecî nêhesibneno zî ma ki veynî. Xwi ra ez zana, semedê ay heway ra ino kar vist mi mil. Wa kar zî kar bibîynî. Ewta ra wardî şo Diyarbekir, ay mêrde-kê "ruşwetwer"î bigeyri, veynî, reydi yew roportajî biki. Ti roportajî biki zî eki hêşêdê Şefî bikewo ja neşr keno, zer ba jey nêbo neşr nêkeno, a renca to zî hêçî bena. Hûmaygirewte mi te-yara reydi zî ray nêkeno. O zî zano ki kar indi erjaye niyo. Bi şaşey fekdê xwi ra vetî, yew pîlî dey rî telefoni kerda, ti ra vato, serranê verênanê hezar û new sey û hewtay di semedo ki yew sawcî tikê fuzuley kerda, girewto kar ra visto. Yew da'wa ki ganî bi-peysnaynî, zaf dergi kerda. Goşê jey zî kaşbiyo, ti ra vajiyawo labelê jey peyeni ey xwi kerda, filan-bêvan. Hewawo ki vanî, ay sawcî hinî nişno awu-qatey zî biko. Yew deme perîşan biyo û inka Diyarbekir di erzihalcîyey keno. Hemîni ra muhî-mêr zî, sawcî Kurd o û Kurdey ser o inê gosirmetî jey serî ser di amey. Şef wazeno ki ino sawcî herkesî rî bibo "îbret". Yewdo ki karo inasarên biko ewta çino labelê o hewna mesela sawcî herkesî vîr fineno.

II
Bi ay betiliyayîşî mi xwi zor yew otêli resna. Otêli zaf xirabeki nêbi. Xwi ra mi nêşiyayî şêra yewda vay, çimki şefê gazetî ez pêt temê kerd-biya, vatbi "Zaf peran xerc meki".

Mi ra ina aseno ki ino gure vemî ra herimiyaye bi. Ma derheqê mêrdekî di çido zaf nêzanaynî. Ma nêzanaynî yazixaney jey kura wo. Tirê waştîni qalî biko yan nêwaştîni? Ma a zî nêzanaynî. Xebera ma ti ra çinibî ki mird bi yan veyşan bi. 'Elm û haya ma inî çiyân ra çinibî. Çiyo ki ma zanaynî, ma zanaynî ki Diyarbekir di maneno û ma namey jey zanaynî. 'Elî Riza Çelîk. Labelê ma hetî o bi xwi hîna vêşî bi ruşwet name-dar bi. Bi Tirkî ti ra vatnî "Rûşwet Yiyen Savci", yanî "Sawciyo Ruşwet-ber". Ino hing di arisayîşî vişêr çiyekî mi rê bar nêbi. Mi va "Hela wa nimaj bibo, ma veynî ma se kenî" û a şewî bi inê fikran ez xwi di şiya. Demewo ki mi çimê xwi akerdî hinî roj di qamî berz bibi. Xwi ra mi şan di katibdê otêli ra zî vatbi ki wa mi hewn ra werizno.

Mi va "Ez ki katibdê otêli ra persa, ay mêrdeko ki ez bede geyrena, beno ki o bişinasno." Ez ti ra persaya, mi va:
-Ti 'Elî Riza Çelîkî şinasnenî?
Va:
-Ney abê, ez qet namewo inasarên pey nêhesiyaya, wazenî yewerna ra persî.

Mi xwi pîze di va "Qay ez nêzana yewerna ra persa, hema ti mi ra vanî; ez to ra persa ya, ti zanî vajî, ti nê-zanî, vajî ez nêzana."
Se ka? Ez ver bi 'Edliya şiya. Mi xwi bi xwi va "Bizano bizano, şarê 'edliya zano; nêbi ez ki yew awuqatî ra persa."

Otêla ki ez te de mendîni 'Edliya ra indi duri nêbi. Ez vejîyaya teber, mi yew pastexane di arîya xwi kerdî ew mi da piro ez şiya 'edliya. Wexto ki ez çarşu di şinî, ez yazixanan ra ewni-yaynî, mi vatîni "Eki yazixaney jey bibo, beno ki ez veyna." Kê ki Dorytol ra ver bi Berê Sara, ver bi 'Edliya şinî, her di kinarandê rayirî di gelekî yazixaney awuqatan û erzihalcîyan bi. Ez ti ra ewniyaya la çî fayde ki name-wo ki ez bede geyraynî mi çiman fek a nêkewt.

'Edliya di mi mubaşir xwi çim a kerd û ez şiya hetî, ti ra persaya. Mu-başir yewdo ri-mulayim bi, peşmiriya, va:
-Ney wilay, ez nêşinasnena, xwi ra ez ewta newe ya. Sewki ti wazenî, ewta cay awuqatan esto, şo jînî ra persî.

Ez şiya cadê awuqatan, baro. Kê ki 'edliya ra şinî zere, baro destê çepî ser o, oda yewini bi. Oda yew oda şeniki bî û a zî sey 'edliya epey verênî

Bawo ewniya ki ez bêkeyf a, persa va:
-Xeyr o, cay çî esto ancina?
Mi zî ti ra va hal-mesela ino hewa. Mi qalê zehmeteya şeyîşê xwi yê Di-yarbekir kerd.
Bawoy va:
-Lajê, indi xwi medejni, şo key 'emida xwi di bimani. Xwi ra ma rewna a zî nêdiya, balê ti veynî.
Mi va: -Herçî ez nêşona keydê jînî. Ti zî zanî 'emizay mi mi ra zaf hes nê-kenî. Baş a ya ki ez xwi rî otêli di bi-mara.
Piy mi te de deja la indi bellî nê-kerd, va:
-De ti zanî lajê.

bi. Boyaxê dêsan hema ki ti ra nê-kewtîni war. Çiki serdeya 'edliya bî, kê vatnî qay ewta pêser biya. Çindi hebî kursî, yew masa lingçewtî, masa ser o yew daktîloyo hînzarserre. Yew kuj di zî çindi hebî cubbey leqnayey bî, ê zî heway daktîloy keyenî bî.
Oda di hîrê hebî awuqatî ronîş-teybi. Yewna zî wey ra bi labelê se-medo ki tipê jey tipê 'evdalan û şeke-rekan mendîni mi xwi hetî o awuqat nêhesibna. Awuqatan ra ez ver bi ay ciwanî şiya. Ey çantey xwi çokandê xwi ser o akerdî, yew dosya ra ewni-yaynî. Lezi kerdîni. Kê zanaynî ki karê jey zaf o. Mi silam da bede, mi va ez filankesî geyrena. Bindê çiman ra tiki xam mi ra ewniya, va yazixaney jey fi-lan ca di wo. Dim a va:
-La beno ki inka o zî ewta bo, ga-ma bini inê cayan ra cay çimê mi ta kewt.
Gama ki mi dey rî teşekkur kerd, mi va "Bexudar bî, Hûmay to ra razî bo" ew ez ageyraynî, nişka ve ra per-sa, va:
-Xeyr o qey?
Ez vana qey bi fikirdê jey ez mişteriyandê yew erzihalcî nêmendî. Xwi ra xerîbeyî mi zî heme cadê mi ra fam bîni. Ez zaf qayîl nêbiya ti ra me-sela xwi vaja, mi va:
-Qet, xeyr o. Çido muhîm çino, ez Estenbul ra amebiya ewta, yew gurey mi bede bi. Tikê bûy zî dano ma, mi waştî yew çaya jey bişima.
Ez ki baro ra vejîyaya, di hebî cendirman yew xorto tem û ciwan xwi ver şanabi, nerdiwanan ro şinî war. Yew cenêka çewres-çewres û panc serra zî bi hesrandê çimandê xwi hin kerdîni ki beyntardê ay wîrdî cendir-man ra vêro ew lajêki di qalî biko. Cendirman ra yew hêrs bi, va:
-Baştâ şo yaykê! Inka ti qalî fahm nêkena? Ma hewî to ra va "Yasax o". Bermayîş ra, ti ka nêverda lajê to şarî bikişo!
Teseliya cenêki ki kewtî, xwi a se-kuy ser o da 'er ro. Qeseba mêrdimî dey rî helisîyaynî, hem bermaynî hem daynî çokandê xwi ro, vatnî:
-Qey şima xwi şaş kerdî? Caran kê qayîl i ki lajê kê yewerî bikişo. Lajê mi hema gede wo, nezan o...
Ay hing di yew mubaşirî zî lista xwi kerdbî xwi dest, çiqas ki te de bi pêt yew name wendî. Be'dî ewniya ki veng a, yew xêzi ay namî ser ra anti, namewo ki dim a yeno, wend.
Ay helmele ki viyart, ez zî ber ra vejîyaya, mi rayirê yazixanedê 'Elî Riza Çelîkî ser na.
Diyayîşê yazixaney 'Elî Riza'yî indi zor nêbi. Mi ki namey yazixaney jey yew tabela ser o dî, mirda xwi keyfê mi ame:
'Elî Riza Çelîk
Heme tewir dilekçey, layihay, temyîzi...

Mi ber kut. Be'dî mi fam kerd ki ber qefilmaye wo. Xwi ra cam ra zî zerre kê ra asaynî, çew zere di çinêbi. Se ka, mi va "Ez tikê bigeyra, gilana bêra".
Ez şiya, nîzdî teştarî ameya. Sewki mi bişinasnaynî ez ka şêra 'edliya di bede bigeyra. Semedo ki mi nêşinas-naynî ew ez qayîl nêbiya lingan ser o reydi qalî bika, mi waştîni ki ez jey ya-zixanedê jey di bivina.
Ez şiya yazixaney jey ki berê jey akerde wo, yew miştîrî zî ha ronîşte wo ew o dey rî erzihalê jey niseno. Si-lamû 'eleykum, 'eleykum silam, ez

Abi hewa bi hinzar û yew fikr û xeyalî ez şan di keye resaya. Feqet ez herey kewtbiya. Gama ki ez keye re-saya bawoyîni nanî ser o bî. Dayê va:
-Ma ti pawitî, ma va qay ti zaf herey yenî.

ŞÛRANÊ EBÛBEKİR PAMUKÇU'Y RA

Çend kesê ki Kurdbiyayina xwi inkar kenî, Almanya di bi na-meyê Raştîye û Zazaistan'î di kovaran (mecmu'ayan) vejenî. Kovara Zazaistan'î ser o bi Tirkî nuştayo ki "Raya Zazaistanî'nin yayın or-ganidir" (Organa neşrî ya Raya Zazaistanî ya). Riperrê yewndesinê hûmara (sayî) hîrina na kovari di bi Tirkî wina nuştayo:
"... Zaza ulusunun ve önderlerinin (Şix Said, Seit Rıza, Ebube-kir Pamukçu) karşısında" (... vera milleta Zaza'yî û serekanê cî (Şêx Se'îd, Seyîd Rıza, Ebebûbekir Pamukçu)...)".

Wina fam beno ki kesê ki kovara Zazaistan'î vejenî, Ebubekir Pamukçu'yî (1946-1991) zey Şêx Se'îdî û Seyîd Rizayê rehmetî gird (pîl) vînenî. Riperrê newinê 'eynî kovari di wina nuştayo:
"Raya Zazaistanî'nin kurucusu büyük ve değerli önderimiz Ebu-bekir Pamukçu..." (Awankerdoxê Raya Zazaistanî, serekê mayo gird û erjaye Ebûbekir Pamukçu...)

Kovara Raştîye zî mirdîya xo wesfanê Ebûbekir'î dana. Hewawo ki riperrê çarinê hûmara yewina na kovari de nuştayo, Raştîye "ven-gê Organîzasyonê Xelîsiyayina Zazayan a" (Zaza Kurtuluş Örgütü-nün sesidir).

Nê her di kovari, hindi zûranê girdan (xîşnan) nusene ki keso ki Ebûbekir'î nêşinasno hima hima ki bawer keno ki o yew "qehre-man" bi. Heto bîn ra Ebûbekirê belingazî bi xwi zî qebûl kerd ki yê tekliîfê polisê Tirkan, MIT'î (Millî İstihbarat Teşkilatı) qebûl kerd û bi nuştîş soz da ki yîni rê xizmet biko. Ebûbekir'î na mesela xwi û MIT'î kovara Pîya (hûmar: 14) di îtiraf kerdîbî.

Ma tiya di şûranê Ebûbekir Pamukçu'yî ra di parçan neqlî kenî. Nê şûran ra "qehremaney", "girdey" û xizmetkareya Ebûbekir'î hîna weş fam bena. Herçiqas ki kovara Zazaistan û Raştîye, Ebûbekir'î gird kenî û vanî o "serekê Zazan o" zî, Ebûbekir nê şûranê xwi di zewbîna (sewbîna) çiyân vano. O vano ki o Yavuz o, o Mistefa Ke-mal o. Kirdî (Kırmancı, Zazay), İllehim zî Kirdê Dêrsimî him Ya-vuz'î him zî Mistefa Kemalî weş şinasnenî.

Ebubekir bi Tirkî wina vano:
BİR ÖĞRETMEN ARIYORUM

Asya'dan koştum, sarstım cihanı
Acem'i, Arapellerini, Frengistan'ı
Güneşi deldi şafakla mızrağımızın ucu
Titretti alemi keskin kılıcımda
Yeniden silkinmek,
Yeniden Türk olmak istiyorum, güçlül

Ebubekir Pamukçu, Kurtuluş Savaşı, İskender Matbaası, İstanbul, s. 26-27*

BEN KİMİM?
Ben Oğuz'um, ben Oruc'um
Mertlerin beyi, ben Alparslan'ım
Söğüt'te yeşeren fidanların beyi, Osman'ım ben
Çaldıran'da, Ridaniye'de, Mekke'de
Müslümanların beyi Yavuz'um ben
At üstünde Mustafa Kemal'im ben.
Adımız Türk,
Dilimiz Türkçe,
Türk'üm, Türk'üm ben.

Ebubekir Pamukçu, Kurtuluş Savaşı, İskender Matbaası, İstanbul, s. 32-34*

Nê şûranê xwi di Ebûbekir wina vano:
EZ MU'ALİMÊ GÊRENA

Ez Asya ra qerifiyaya, mi cihan tê şana
'Ecemîstan, 'Erebîstan û Frengîstan
Serey rîmanê ma roj qulî kerd serê şefeqî di
Şimşêrê min ê tîjî di 'alem lertzna
Ez wazena newe ra weşaniya
Newe ra Tirk biba, hêzdar

EZ KAM A?
Ez Oxuz a, ez Oruc a
Mîreyê camêrdan, ez Alparslan a
Ez mîreyê xortanê ki Söğüt di gird benê, Osman a ez
Çaldıran di, Ridaniye di, Mekke di
Mîreyê Mîslîmanan Yavuz a ez
Estorî ser o Mistefa Kemal a ez.
Nameyê ma Tirk,
Ziwanê ma Tirkî,
Tirk a, Tirk a ez.

Nê şûran ser ra mêrdim se vajo? Bêguman mêrdim nêşiyoy vajo "Ebûbekir'î rî 'eferim!" feqet " 'eferim Ebûbekircîyan rî" ki mêrdim-êdê wina tersonek û bêistîqrarî "serek" hesibnê.

*Biewnî: Faik Bulut, Belgelerle Dersim Raporları, Yön Yayın-ları, İstanbul, 1991, s. 18

Yekîtiya Sovyetan ket...

Wî jî di 25'ê Çileyay Pêşîn de îstîfa xwe da û şifreyên çekên nukleerî teslîmî Serokê Rûsyayê Borîs Yeltsîn kir. Bi îstîfakirina Gorbaçov re ala Sovyetê ya das û çakûç li ser ji Kremîlê anîn xwarê û ala Rûsyayê ya spî, kesk û sor hat daleqandin. Parlamentoya Sovyetê jî xwe fesih kir.

Li gor beyana civîna Alma Atayê wê Rûsya di Konseya Ewlekariya Netewên Yekbûyî de ciyê Yekîtiya Sovyetan bistîne. Wê organa bilnd ya CDS jî ji serokên 11 dewletan pêk bê ku jê re dibêjin "konsey". Wê jî bilî konseya bilind, di warê eskerî, aborî, îdarî, ewlekariya hundir, siyaseta derva de jî konseyên din pêk bîn.

Wek tê zanîn li 4 komarên kevin yê Sovyetê çekên nukleerî hene. Ji van 4 dewletan Kazaxîstan dixwaze kontrola çekên li ser axa wê di destên wê de be. Sê dewletên din ku çekên nukleerî li ser axa wan hene; Rûsya, Ûkrayna û Rûsya Sipî ne.

Di warê eskerî û aborî de di navbera dewletên Civatê de problemên mezîn hene. Ûkrayna, Azerbeycan û Moldaviya dixwa-

zin ordiya wan a taybetî hebe. Ji nuha ve serokê Ûkraniya Vlademîr Kruçkov û serokê Azerbeycanê Ayaz Mutalîvov xwe wek kumandarên ordiya xwe îlan kirine. Di civîna Mînskê de ku di 30'ê Çileyay Pêşîn de çêbû xwiya bû ku endamên Civatê li ser pîrsên aborî, eskerî û pîrsên din li hev nakin. Di vî civînê de tenê li ser kontrola çekên nukleerî hat lihev kirin. Îro herçiqas problemên mezîn di navbera herdu dewletên mezîn; Rûsya û Ûkrayna de hebe jî, dewletên Asiyayê wek do, îro jî şika wan ji hegemonyaya Rûsya-yê heye. Çunkî Rûsya bi dewlemendiya xwe ya binerê û sererd, bi teknîka xwe û bi potensiyala xwe ya nufûsî jî wan gelek bi pêş de ye.

Îro kes nizane ku wê Civata Dewletên Serbixwe bi çi alî ve here. Hin pispor dibêjin wê forma Civata Ewrûpa bigre û hinek din jî dibêjin wê bi vî hawî jî bi ser nekeve.

Gezenca Tirkîyê

Di perçebûna sîstema Sovyetê de dewleta herî bi qezenç Tirkîye derket. Ji nuha ve komarên Sov-

yetê yê "Tirk" di warê aborî û kulturî de ketin ber bayê Tirkîyê û Tirkîye jî xwe re wek sîwan dibînin. Serokên dewletan yek li dû yekî diçin Tirkîyê. Eşkere ye ku têkiliyên van dewletên Asiyayê bi Tirkîyê re wê zerarê bide tevgera rizgariya Kurdistanê jî. Şik tune ye ku sibê ev dewlet jî li gel Tirkîyê wê li dijî tevgera azadîxaz a Kurdistanê bisekinin.

74 salên sosyalîzmê û 69 salên Yekîtiya Sovyetê, piştî perestrojka û glasnosta Gorbaçov têk çû. Îro komunîstên Sovyetê jî bo ku sîstema kevin perçe kir Gorbaçov rexne dikin, reformîstên Sovyetê jî bo ku sîstemê nuh ava nekir Gorbaçov rexne dikin û xelk jî jî bo ku jiyana wan xerab bû û bûn muhtacî xerbê, Gorbaçov rexne dikin.

Gorbaçov bi kirinê xwe him sosyalîzm, him Yekîtiya Sovyet û him jî xwe xist nav rûpelên dîrokê. Lê gelo dîrok wê wî efû bike, ya neke, îro ev ne diyar e. Tiştê xuya ye wê di vî warî de jî tim dîtînen cuda hebin.

Lewend Firat

H. Mizgîn li ser dara ...

pirtûk hemû jî li ser dîrok, edebiyat, folklor û kultura Kurdan in. Piştî vî rastiyê, hîn jî gava H. Mizgîn rabe bibêje "heval naxwazin ez bêjim em munaqesha dîroka xwe bikin" êdî jî nerastgotinê jî wêdetir buhtan e.

Min bi xwe ji hejmara 40'î heta ya 62'an (1983-1986) berpirsiyariya Armançê kiriyê. H. Mizgîn wê demê jî endamê redaksiyonê bû. Di navbera wê tarîxê de ne wî bixwe xwestiyê li ser tarîxa Kurdan tiştekî binivîse û ne jî pêşniyar kiriyê ku bila hevalekî din binivîse. Lê di vî warî de me dîsa jî nivîsên gelek hêja weşandine. Mesela nivîsên heval Zinarê Xamo (nivîsa li ser serhildana Şêx Seîd û li ser serhildana Dêrsimê û yê wê wan, (ku hemû bêimze ne) jî bo vî yekê minakên berbiçav û hêja ne. Ji xwe Armanca îro jî li ber bi çava ye, ne hewce ye ez tiştekî lê zêde bikim. Lê di vî navberê de H. Mizgîn jî ji rojnama APK (Arbetar Partiet Kommunisterna), Norrsken Flaman û APN'a Sovyetê meseleyên dinyayê tercumeyî Kurdî dikirin.

H. MIZGÎN INTERNAS-YONALÎSTTIRÎNÊ ME BÛ

Ji hevalên me bîyî H. Mizgîn kesekî din ne endamê APK bû. Çi di civînên me de û çî jî derve di nav gel û dostên me de, jî tirsî H. Mizgîn kesî newêribû rexneyek li sosyalîzmê bigirta û bi taybetî li Yekîtiya Sovyet. Di 1'ên Gulanan de, li Uppsalayê, ez jî tê de

em hemû Kurd VPK re dimeşyan; H. Mizgîn bi çend Tirk, Ereb û Yewnaniyên "enternasyonalîst" re, bi partiyeke jî VPK hîn komunîsttir bi APK re dimeşyan. Lê tevî van tewrên wî jî ez nikarim bibêjim H. Mizgîn wê demê ne Kurd bû û Kurdayetî kiribû qurbana enternasyonalîzmê.

Esas şifreke nivîsa H. Mizgîn heye, ku mirov "em" û "me" yê nivîsa wî bi "ez" û "min"ê ve biguhere wê nivîs jî gelek çewtî û îthamên ne di cî de bê pakkirin. Çimkî gelek şaşiyên ku ew wek şaşiyên me nîşan dide, di esasê xwe de yê wî bi xwe ne.

AZADIYA LI SER BINDESTIYA GELEKÎ DIN AVA BIBE...

Ew mafê ku ez ji bo gelê xwe dixwazin, ez ji bo her kes û tev gelê bindest ên welatên din jî dixwazim. Ez tu carî azadiyeke weha naxwazim, ku li ser bindestiya milletekî ava dibe. Ev yek jî bo Filistîniyan jî weha ye. Gava leşkerên Îsraîlî

êrişî jin û zarokên Filistîniyan dikin, ku ez bixwazim jî, kêfa min pê nayê, êşa wan dide dilê min. Dema ez bi lédana wan kêfxweş bibim, ev tê wê manê ku min jî însaniyeta xwe gelek tişt wenda kiriyê. RRF (Rêxistina Rizgariya Filistîn) û hêzên din ên Filistîniyan dikarin dijî natiya Kurdan bikin. Mesele, meseleyeke prensîbî ye, ne mesela hêzan e. Ez bi xwe li dijî im ku Kurd bibin leşkerên Filistîniyan, lê divê nebin ên Îsraîl jî; nebin yê tu kesî.

Lê sedem çî dibe bila bibe, bi vî metoda Heval H. Mizgîn li meselan hûrbûn tu feydê nade tevgera gelê Kurd. Pêşeroja gelê Kurd a azad, wê li ser milên kadroyên ku bi çavekî objektîv û bi awakî afirandî li dîroka xwe û li dinyayê dinêrin û jê dersan derdixin ava bibe. Ne ku li ser milên kadroyên ku bi navê "lixwevegerîne" her tiştî înkâr dikin. Ez hêvîdar im, Hevalê min ê hêja H. Mizgîn, bi van rexneyên min li ser dara sêvan peya be û li ser dara hirmiyar li hirmiyar bigere.

Namên gihastî

Qurbaliyê Kînyaz/Kazaxîstan, Roza Çolpan û Şahîne Soreklî/Awustralya, Temel Demirer/Tirkîyê, Welato/Rûsya Spî, Prof. Şakîrê Xodo/Ermenîstan, Yado/Bûlgarîstan, Komkar/Almanya, Amed/Fransa, KDP-Î/Fransa, Hevkar/Almanya, Dijwar Kurd/Polonya, Ahmet Cantekin/Swêd, Xwendevanekî we/Swêd, Mehmed Uzun/Swêd, H. Alpay/Kurdistan, R. Dilan/Kurdistan jî me re name û kartên serê salê yê pîrozbahiyê şandine. Em spasî we dikin û li hêviya namên we yê nuh in.

Ji bilî qereperê ...

bêtesîrkirin û hwd. Yekî rabû got "Herêm paş ve maye, heger em ji hêla aborî ve herêmê bi pêş xî, wê pîrs hel bibe".

Yekî din rabû got "Gelşek rastîn li herêmê tune ye, gelş derewîn e, jî aliyê hin cîranên me ve tê pîj kirin". "Emperyalîzm dixwaze me perçe ke".

Ji kesên peyivî yekî ne got, gelê Kurd heye, nuha em jî vî rastiyê qebûl dikin. Ji mafê xwe bê par e. Heta ku em wan mafan nedin wan ewê her li dûv mafê xwe bin û ev gelş jî xelas nabe.

Dema parlamenterê Şîrnexê Mahmûd Alînak axaftina xwe ya li ser navê SHP'ê kir, parlamenterê DYP'ê êrişê birin ser, nehiştin axaftina xwe temam bike û ew bi zorê jî kursiyê anîn xwar. Halbûkî Mahmûd Alînak tu tiştê jî negotibû. Wexta wî got: "Dema rê li ber li mafgerandinê bê girtin, wê gavê jî mirov li riyên edaletê bi destê xwe bi cî bike, bigere". Parlamenterê DYP û ANAP'ê reaksiyonek mezîn nîşan dan û bi

destên xwe li masa xistin û xwestin ku M. Alînak gotinên xwe bi paş ve bigre. Mahmûd Alînak got: "We ez xelet fêm kirim. Du birayên me şehîd bûn, yek esker bû yek jî PKK'yî bû." Piştî van gotinan jî alîkî ve serokê civînê got wexta te qediya û xwest gotina wî bibire, jî aliyê din ve jî parlamenterê DYP'ê ew bi zorê jî ser kursî anîn xwarê.

Parlamenterê Kurd di dema xwestina mafê axaftinê de ne li meclîsê bûn. Ji ber vî yekê kes jî wan ranebû neaxîfî. Dibe jî dudilîyê be; em rabin biaxîfîn, mecbûr in çend gotinên ku bi dilê gelê Kurd be bikin, dema em vî jî bikin dibe ku ciyê me yê di SHP'ê de bikeve xeteriyê.

Ji bilî qereperê jî Kurda re dîsa tiştê tune. Heta nuha politîka dewleta Tirk, "miletêk bi navê Kurd tune ye" bû politîka hukumeta nuh jî "Kurd hene, lê hewcedariya wan tu mafan tune ye" ye.

M. Bextiyar

Terora dewletê...

Mazîdax, Batman, Bedlîs, û li Diyarbekirê dikanên xwe girtin, neçûn mekteban, otomobîlên xwe nexebitandin. Li gelek ciyan meşên protestoyê çêbûn.

Li Tirkîyê di serî de hukûmet jî tu der û kesî dengê derneket. Lê di dema protestoya Bakirkoyê de agir bi dikana birayê waliyê Kurdistanê Necatî Çetînkaya ket û 11 kes mirin, orin bi hukûmet û giregirên Tirkîyê ket û gef li

"terorîstan" xwarin. Rojnamên Tirkîyê, televizyona dewletê şîna merivên kuştî û cesedên kuştîyan şanî dan.

Canê wan can e, lê canê me balîcan e. Bûyera Pasûrê bi zanebûn û ya Bakirkoyê bêhemdî çêbûbû. Lê bûyera Bakirkoyê herçiqas bê hemdî bû jî da nîşandan ku dema mirov bi terore bibile, wê rojekê pêtiyên terore bi mirov jî bigre.

Rojnamevanî...

Lê roportaja herî hêja ew e ya ku xwerû jî metnê jî destê ewil pêk tê. Roportajên Yaşar Kemal jî di vî warî de nimûnere hêja ne. Hinek mahîr hene ku her du metnan jî bi hostatî bi kar tinin û roportajên hêja dinivîsin.

Ji beriya vî nivîsê xilas bikim dixwazim ferqa navbeyna roportaj û romanê binivîsin. Di romanê de fikir, tîp, qehreman, rol, teswîr û gelek tiştên di hemû eserên nivîskarî ne.

Nivîskarî ew bi xeyal, hiş û birên xwe afirandine. (Bi şertê ku mirov wek hinek nivîskaran nivîsên kesên din rûper-rûper kopya nekiribe). Di roportajê de muxabîr mecbûr e rastiyê binivîsîne. Ew nikare tiştên neyî bîafirîne, lê dikare jî tiştên heyî yê herî baş li gor xwe bibijere û di derheqê wan de binivîsîne. Teswîre tenê jî ku ne rast be, dikare roportajê hemûyê jî binî bîhêrifîne.

Em sersala xwendevanên xwe pîroz dikin û hêvîdar in ku sala nû jî bo gelê me bibe sala azadiyê, serketinê û ronahiye

Redaksiyon

Nûdem

Bi armanca dagirtina valahiya salan kovara hunerî, edebî û kulturî NÛDEM derdikeve! Ger hûn dixwazin ji edebiyata Kurdî û ya dinyayê haydar bibin, nûçeyên nû bibihîzin û bi demê re gavan bavêjin, wê çaxê NÛDEM'ê bixwînin!

Navnîşana danûstendin û pêwendiyê:

F. Cewerî
GamlalandsV. 36
740 41 Vittinge
Morgangava/ SWEDEN

Rojnamevanî û Kurdo Baksî

A. Zêrevan

Di ji mara 77'ê ya Berbangê de nivîsek li ser "Rojnamegeriya Kurdî..." bi îmtiza Kurdo Baksî hatiye çapkirin. Ezê çend rêzikan li ser bêberpirsiyariya Kurdo û bêdîqetiya redaksiyona Berbangê binivîsinim.

Kurdo Baksî bêyî ku ji rojnamevaniyê fêhm bike xwe avêtîye nav munaqeseyê giran. Wekî din jî, ji bo ku mirov bikare munaqesê li ser rojnamevaniya Kurdî bike, divê mirov serdestê zimanê Kurdî be. Bingehê rojnamevaniyê li ser zanîna û bikaranîna ziman e. Di nivîsa Kurdo de hevokên tenê bê kêmasî nîne. Ez meraq dikim ka wî çawa cesaret bi xwe re dîtîye ku nivîsek wiha bêserûber binivîsîne. Şika min heye ku redaksiyona Berbangê jî ew nivîs bêyî ku xwendibe çap kiribe.

Çend mîsalan jî nivîsa Kurdo li jêr dinivîsinim.

"Di wî warî de divê rojnamevanên Kurd pirsên di hevpeyvîna de kêmîtir ci bigrin û divê di semivîsan de diyar bibe ku hevpeyvîn e". Weke ku tê dîtin hevok ne rast hatiye avakirin. Ez fêhm nakim qesta wî ji "kêmîtir"ê jî çî ye, ango pirsên jî çî "kêmîtir"?

"Di reportajên Kurd de tûcar behsa ew tiştên ku li ciyê reportajê dibînin û dibîhisim nayên ziman". Ev cara ewil e ez pê dihesim ku reportajên "Kurd" hene. Li gor zanîna min reportajên Kurdî hene.

Kurdo bi îddîyayê nerast wiha dinivîsîne: "Rojname û kovarên Kurdî hejmaran an jî mîjûyê tenê di rûpelên yekîti de dinivîsinim". Ev îddîa ne rast e; kovar û rojnamên Kurdî li holê ne.

Kurdo di nerastîya nivîsandinê de tu hidûdan nas nake, lewra dibêje ku rojname û kovarên Kurdî mîzanpaja xwe li ber ya kovar û rojnamên çep yê cihanê çêkirine. Ew xwe li vir jî nagire, dibêje ku mîzanpaja Pravda bûye nimûne ji gelek rojname û kovarên Kurdî re. Ev îddîa jî ne rast e, ji ber ku Kurdo nikare bi tu şiklî ve bide izbatkirin. Xusûsiyetek ya kovar û rojnamên îdeolojîk/polîtîk heye; ew jî pîrbûna nivîsan û kêmbûna risman e.

Wekî din, di rojname û kovarên îdeolojîk/polîtîk de lazîmîya pîrbûna risman tune. Ez mereq dikim ka kûdera mîzanpaja Armançê û Kurdistan Pressê wek ya Pravda ye.

Kurdo dibêje: "Berî her tiştî divê di semivîsekê de lêker hebe". Divê û divê. Tu vê mecburiyê jî ku derdixî? Rojnamên êvaran (Aqşam gazeteleri) jî bo sansasyonê lêkeran bi kar tînin, mebest jî lêker bikaranîna jî ew e ku hereke/jiyan bikeve nivîsê. Gelek caran mirov bi semivîsên ku hereke/jiyan tê de heyî dixape, diçe rojnameyekê dikire, paşê jî lê hay dibe ku di nivîsê bi xwe de tu informasyon tune.

Kurdo bêyî ku nimûnan bide pir îddîa di derheqê rojnamevaniya Kurdî de kirine, kesê mereq bike û bêhnfire be, dikare nivîsa Kurdo di Berbangê de bixwîne.

Piştî vîqes sergêjayîyê ezê hinek tiştan li ser reportajê û reportajnivîsandinê binivîsinim.

Wek ku tê zanîn reportaj jî tekst/metnekê pêk tê. Tekst jî kelîma Latîni "textum" tê. Me'na wê "tevn" e. Metnek jî tevna "çirokan" pêk tê. Mahirî ew e ku mirov aletên tevnê (têravêtin, masûr, kerkî, pîjik, befsîk, gwîr, pij-

dar û yê din) nas bike. bi zanîna xebitandina van aletan mirov dikare raçandinekê bîne wicudê. Ji xwe reportaj jî bi kompozîsyon û unsûrên xwe wek tevneke baş raçandî ye.

Ji beriya ku ez behsa form û unsûrên reportajê bikim, dixwazim te'rîfa wê binivîsinim.

Reportaj, behskirin/nivîsandina realîtekê ye di zemanê nû de, ku jî dîtin û serpêhatiyên muxabirî yê di mekanê "bûyer"/waqî'ê de pêk tînin. Ew dîtin û serpêhatî jî gelek di wextek kurt de ji alî muxabir ve hatîbin jîyan. Zeman û mekanê "bûyer"/waqî'ê jî lazîm e pir belî be. Ew "bûyer"/waqî'a ku mirov behsa dike gelek bi destxetê rojnamevaniyê hatîbe raçandî û aktuelîtiya wê jî şamilê wextek dirêj be.

Muxabirê reportajê divê bi xelkê re bipeyive, lêkolînan çêke, dîtin û hisên xwe yê di mekanê "bûyer"/waqî'ê de binivîsîne, teswîra dorûber û mirovan çêke, hebûna xwe li mekanê "bûyer"/waqî'ê de bide diyarkirin, ango te'beke zêde bide xwe.

Reportaj jî du texlît metnan pêk tê. Yek, metnê jî destê ewil. Du, metnê jî destê diduyan.

Metnê jî destê ewil: Di metnê jî destê ewil de lazîm e muxabir xwe bi xwe tiştan bibîne, bibihîse, bêhn bike û bijî. Paşê jî divê ew bi formulasyonên xwe hevokan ava bike û kompozîsyonê li hev ragire. Divê ew wek rejîsore'n filiman sehneyan di serê xwe de ava bike, wan sehnan wekî filimekî li hev ragire û pêşkêşî xwendevanan bike. Bi vî şiklî hemû tiştên di reportajê de wek eserên muxabirî tînin hesibandin. Alîkarîyek zêde ya wan kesên ku muxabirî hevpeyvînê pê re çêkirî an jî çavkaniyên di di vî de nîne. Reportajnivîskarekî meşhur di vî babetê de rojnamevanê Almanî Gunther Wallraff e.

Metnê jî destê diduyan: Di metnê jî destê diduyan de serpêhatî û dîtinên muxabirî tunene. Ew mehkûmê destê kesê ku ew pê re hevpeyvînê çêdike ye. Muxabir çavîdestê dokûment û çavkaniyan e. Muxabir wek kesekî xerîb û ne şehreza tiştên ku hinekî din dibêjin neqil dike. Ango "berdevkê" hinekan e. Muxabir berdevkîti û neqilîkirinê jî bi du şiklan dike. Ya bi "jêgîritna veşartî" ya jî bi "neveşartî".

Mîsal jî bo "jêgîritna veşartî": Filankesê got, ezê serê xwe bişûm.

Mîsal jî bo "jêgîritna neveşartî": Filankesê got: "Ezê serê xwe bişûm".

Muxabir di metnê jî destê diduyan de şîrkatiyê bi çavkanî û wan kesên ku ew pê re hevpeyvînan çêdike rê dike.

Reportajên ku bi enformasyonên jî destê diduyan hatîbin nivîsandin ne hêja ne, ji ber ku ne jîndar in, ne edebî ne, ne dramatik in û ne şexsî ne. Heger mirov bixwaze hêjabûna reportajekê fêhm bike, divê mirov li metnê jî destê ewil û li yê jî destê diduyan binêre. Xwendevan dikare informasyonên jî destê ewil yê di reportajê de bi qelêma sor îşaret bike û informasyonên jî destê diduyan bi qelêma kesk îşaret bike. Hêjabûna reportajê girêdayî zêdebûna rengê sor e. Hingî rengê kesk zêde bibe, reportaj jî hêjabûna xwe wînda dike. Ku metnê jî destê ewil ne zêdetir be, reportaj reportajîtiya xwe wînda dike û dibe hevpeyvîn an xeber.

Dûmahîk: r. 11

BEROŞ

AŞXANA SERVEKIRÎ



Mahmûd Lewendî

DÎSA REKLAM...

Welê xuya ye şîrketa me ya reklamê ne tenê li nav Kurdan her weha li nav Tirkan jî deng da. Çimkî me du hejmar berê, di Beroşê de nimûneyek ji reklama Kurdî nivîsî. Kovara 2000'e Doğru jî ev reklama me wergerand Tirkî û di hejmarê xwe ya 1/12/91'an de çap kir. Lê ecêba mezin ew e ku van hevalan gotine qey bi rastî me şîrketek welê danîye. Lê welê xuya ye ku birayên me yê Tirk ne tenê dewletê, lê henekan jî layiqî me nabînin. Çimkî wextekê dîsa me bi henekî got "Elvis Presley Kurd Derket", rojnama Hürriyetê niv rûpelê cih da vê xeberê û xwest îspat bike ku Elvis Presley ne Kurd e.

...û MINKIR-NEKIR OGULLERİYAN

Îcar çendekî berê kurdekî li Diyarbekirê bi navê "Cenaze İşleri ve malzemeleri" dikanek vekirîye. Qey bihistîye ku me şîrketa reklamê danîye, li ser vê yekê nameyek ji me re şandîye. Dixwaze ku em bi Kurdî jê re çend nimûneyên reklaman çêkin. Îcar me jî çend nimûne jê re çêkirin û şandin. Ji wan nimûneyan yekê jî em li vî derê çap dikin, ji bo ku dikandar û şîrket û muesseyên me yê din bibînin û "begem" bikin da ku em ji bo wan jî reklaman çêkin.


"Tendür Şirket"

Stockholm'de yayımlanan Kürçe aylık Armanç dergisinin 121. sayısında Mahmûd Lewendî imzasıyla "Tendür Şirket" başlıklı bir yazı çıktı. Yazıda çeşitli meslekleri deneyen ancak başarılı olamayan iki Kürdü'nün reklam şirketi kurmakta karar kılması anlatılıyor. "Her dilde reklam yapılıyor da nedir Kürçe reklam yapılmaz" diyerek, "Tendür Şirkete Reklamê Kurdî" isimli şirketlerini kurmayı kararlaştırıyor ve bir kaç reklam örneği veriyorlar. Şirketin adının "Tendür" olmasının gerekçesi de şöyle: "Tendür" Türkçe "tandır"ın karşılığı. Kürd kadınları farın başında toplandıklarında birbirlerine köydeki güzelliklerini övüyorlar. Bu övgüler de kısa sürede bütün köye yayılır. Şimdi "Tendür Şirket" in reklamlarından bazı örnekler:

Vexwe COLA	COLA lî Çêllîkê!
Bibe pola!	Dîgîn, dernek, halayda
Li dawet û dilanê	Lezzet SEYLAN çayında!
Vexwe çaya SEYLANE!	Bir tas su lî ASPİRİN
Tasek av û ASPİRİN	Kalmaz yara wê siz!
Namîne şî û bîrin!	Sigarayê kızı-mızı
Cixara me soro-moro	Biz lîçeriz MARLBORO!
Em dîçşînin MARLBORO!	Lezzet û ta'm û xweşî
Lezzet û ta'm û xweşî	Lezzet, tad wê hoşnîk
Tu jî MARLBORO dîçke!	Sende mi MARLBORO lîçerisun?
Kî hat?	Kim geldi?
Mendo hat.	Mendo geldi.
Bî çî hat?	Neyle geldi?
Bî FIAT.	FIAT'la geldi.
Erd qelîş	Yer yarîdî
Esman feîşî	Gök çökîrî
Bîrîskê veda	Yûdîrîm çaka
VOLVO'yê deng da!	VOLVO nam saldi!
Kurê Evdalê Zeko	Evdalê Zeko'nun oğlu
Xwedîyê Saeta SEIKO!	SEIKO saatîni sahibî oldu!

Servîsa kefen, tabût, telqîn, yasîn û hemû karên dunya wî alî tînin kirin.

Paqîj, erzan, bi lez!



Kevirên goristanê tînin nivîsandin. Yasîn li ser mirîyê we tê xwendin. Bedilheca we tê kirin. Mirîyê we tê şuştin. Telqîna mirîyan tê xwendin.

Kefenê we tê birrîn. Li gor her termî tabût hene. Mirî gotîye li ba me gotîye!



Şîrketa Minkir-Nekir Ogullerîyan Derê Mêrdînê-Diyarbekir.

ECAYÎB

Çendekî berê di rojnameyê Swêdî de xeberê derket. Mirovekî 70 salî, ev serê 14 mehan e ku di mala xwe de mirîye, haya kesî jê nebûye. Şîrketa xêni di nav pênc-şeş mehan de çend name şandîne daku ev mirov kirêya xwe bide, lê tu deng jî mirovî dermeketîye. Paşî şîrketê ew daye mahkemê, mahkemê çend name û bang şandine, lê dîsa deng jî mirovî dermeketîye. Dawîya dawî dane îcrayê, Memûrên îcrayê jî çend name û teblîx şandine, lê dîsa ne bersivek, ne xeberek.

PARASTINA ZIMAN û EDEBA KURDÎ

Li Almanyayê jî bo hevkarî û xebata bi hev re 60 Kurd hatine ba hev. Ji biryarên wan yek jî, derxistina kovar an rojnameyek bi Kurdî ye. Lê belavoka wan bi Tirkî bû.

PEN'a Kurdî ku nivîskar û edîb û şairên kurdan tê de cih girtine, belavokên wan ên ku heta îro gehîştine destê me hemû bi Tirkî û Înglîzî ne.

ne karê aqila ye lê rast e

Amadekar: Hesên Mizgîn

◆Swêdî bi teknîkeke nû, di bin erdê de li ku av heye, dikarin bi rehetî derxin. Makîna ku mirov dikare bi xwe re bigerîne, elektrîka erdê dipêve û komputera ku bi vî makîne girêdayî ye ciyê avê tesbît dike.

◆Arkeologên li Ohioyê mikrobên 11 000 sal berê dîtin. Ev mikrobên 11 000 salî li nav ûrê mastodontekê (şiklekî fila ye) di nav qeşayê de hatin dîtin. Li gor arkeolog Gerald Goldstein ev mikrob jî dema qeşayê ne û jî xisûsiyetên xwe tu tişt wînda nekirine.

◆Lêkolînerên ji Awustralyayê proteîneke tabî ya bi navê EGF dîtine. Dema mirov vî proteîne dide pez, dirêjbûna mûyên wan 24 saet radiweste. Proteîna

EGF bi derziyê tê dayîn û mûyê pez jî xwe ve diweşin, lê piştî 24 saetên din mû cardin dest bi dirêjbûnê dikin.

◆Kesên kor bi kamerayê nû dê bikaribin bi awayek rehetî hareket bikin, herin û werin. Kamera li ser zikê mirov tê bicihkirin objektîfa kamerayê risman diguhezîne deng. Bi vî awayî kesê kor tiştên li hember xwe "dibîne".

◆Şîrketêke Amerîkî jî bo filmên rontgenê metodeke nû dîtîye. Li gor vî metode ne hewce ye ku mirov filma rontgenê bi maddeyên kîmyayî bişo. Film tenê tînin germkirinê.

◆Astronotên Amerîkî ji Unîversîteyên Rice, Maryland û Hawaiyê li asîman quleke reşî-tarî dîtine. Ev qula reşî-tarî di galaksa NGG 6240 de ye û jî dinê 300 milyon salên tirêjê dîr e.

◆Li Gronlandê berfa ku sedhezâr salan li ser hev bariyayê qeşayek 3,2 km qalînd çêkirîye.